

# WELAT

# E

v pirsgirêk ji bo  
Tirkiyeyê pirsgirêka yekemîn  
e. Qedera welat ji bi vê pirs-  
girêkê ve girêdayî ye.

Ku em bi şêweyeke  
demokratik û siyasi çareser  
nekin, emê di bin vê pirs-  
girêkê de bimînin.

Di destpêkê de digotin:  
"Ev ji me ye, ne zilameki  
bitalûke ye. Hin tiştên ku  
dike jî, ji nezanîna xwe  
dike..."

Dema di heqê min de doz  
vekirin, dozger jî wisa  
difikirî. Heta ku min di roj-  
nameyê de dest bi nivîsinê  
kir. Min diyar kir ku tiştên ez  
dikim bi zanebûn dikim; wê  
wextê rewş guherî.

Tirsa min a destpêkê ji çi  
bû? Min digot; ew bi vî rengî  
wê di nav gel de dijminatiyê  
biafirînin... Ô dema em li  
rewşa îro mêze dikan, em  
dibînin ku ew tirsa min ne  
beredayî

Röpel 8-9



**"Ne bitalûke ve  
ji me ye, iê nezan e!"**

- ✓ A. MELİK FIRAT bi sernavê "Refah û sistema derewan..." hem pergala kemalî û hem ji Partiya Refahê tevi Necmettin Erbakan dinirxîne. Röpel 13
- ✓ Ji pênûsa kurdologê bi nav û deng ROGER LESCOT ô fransiz analizeke girîng der barê "Destana Memê Alan (1)" de Röpel 4-5
- ✓ "Dr. Cemşid Bender: Alim û lêkolînerê bicesaret", MİRHEM YİĞİT di vê nîvîsa xwe de li ser zebatôn der barê dîroka kurdî de radiweste Röpel 7



6

Zana Farqinî:  
Alî Urungu kî ye?



7

Prof. Xalidî: Kêşeya kurdî bi  
riya leşkerî çareser nabe



10

Salihê Kevirbirî:  
Rengek ji civaka me: Ezidî

## Ji Xwendevanan

**SELAM** û rîzê xwe jî xebatkarêñ Rojnameya Azadiya Welat re dişinim û, ji we re serkeştinê dixwazim. Daxwaziyeke min ji we heyê ku bûn cih bidin. stranê servan, êdî baştır dibe. Em bi Azadiya Welat zehf këfxweş dibin û pê-serbilind in. Azadiya Welat, azadiya gelê kurd e û zimanê gelê kurd e. Disa dibêjim ji me re serkeştin.

**ŞAKIR DEVİRİM**

KARÊ rojnamevani kareki herj girîng û pêwest e ëdi warê civakî û siyasi de. Civakeke xwe ëdi çapemeniya neteweyî (bi gertê ku ev çapemeni têkiliyên xwe li hemberî otoriteyên şerfiraz û serbilind bi xwe ava kiribe), di warê parastina masen xwe yê civakî, polûkî û nejeweyî de xwedî çekekê heri bilind e.

Neteweyeke bindest, mîna kurdan divê di her warî de xwedî çalakî û têkiliyên pêşverû be. Em rojnamevaniyê, divê wekî leşkeriya enformasyonê bin ber çav. Ji ber ku civaka kurdan iro di bin gertî metîngehi de ye,

**SELAMI TURAN  
DİYARBAKIR**

EZ pêşî silavêñ xwe yê dilgîrm û şo-reşeri ji we re dişinim. Ev du hêste bû rojnamehe dernediket. me hemû xwendevan zehf pê şikestin. Me di got qey ha-te qedexekirin, lê belê cardin derket em gelek pê dilgad û këfxweş bûn.

Bimîn di xweşiyê de.

**HEWAL BIRİNDAR**

W

## Rewşenbîr û rewşparêz

MEHMET GEMSİZ

**E**m, kêsên xwende û rewşenbîr teyî hev dikin. Ev. yek ji, ji pergala Tirkî ye yê tê. Rast e, her civak li gorî xweseriya xwe maneyê li terîman bar dike. Îcar ku ew terîm ji nav wê civakê dernekete û ji derve hatibe standin.

Gelok netewe iro xwe bi termönolojiya Rojava şfâde dikin. Hêm dîroka xwe, hem bastûra (bûneyea) civaka xwe, hem cihanê û hwd. Em ji wisan in.

Li vir, dîvî em raştiyê bîbînin û li ser naveroka wan terîman baş rawestin. Yek ji wan terîman ji rewşenbîr e. Çendî peyvî kurdi be ji li gorî peyya "entellektuel" a êwrûpî hatîye çekirin.

Mebesta me ne analîzkirina peyvan e. ku kâ ew ji kîjîn hêmanan hatîye pê, wateya wê ya hîmî ev e, ya mecaziî ew... ji bo me wateya wê ya gişî girîng e. Em dê di 'şûna "entellektuel" de ji peyva rewşenbîr-bî kar bîpin û lj ser wesfîn rewşenbîr bisekinin.

Rewşenbîr hişaza ye, hişê wî/wê ne di binê ipotekê de ye û serbest e. Pivan jê re

"mâr" e. Mafen demokratik, ku ew li hemû cihanê wekî mafen jênager û tênebi-hur, têne pejirandin. Li qanûnen heyî bi çavekî realist dînihêre. Jê re rawebûna (meşrûbûna) wan girîng e.

Mamoste Besîkçi di dâdgeheke xwe de wiha li heyata dâdgehê deng dikir:

"Te diyê qanûn ji aliyê pênc generalî ve û tê diyê ji aliyê 450 pârlementerî ve hatibin çekirin, ji bo min ew çend ne girîng e. Ji bo min a girîng rawebûna wan e."

Her wiha rewşenbîr çalak e; dirame, ramânê xwe bi her riyî derdibe. Dêbara wî li ser hilberîna zjhîn ye. Beşpjrs û peyvirîn wî/wê hîta bi hetayê ye. Anglo heta dinya ava be. Ji ber ku ew maşparêz e, ji aliyê stembaran (mezlûman) e, li hemberî stemkaran (zalîman) e. Stembar ji-ci olî, neteweyî, mîzhebi, rengî, nîjadî, zayendî û hwd. dibin bişa bibin û her wiha ey helwesta wî/wê, ji bo stemkaran ji wisân e.

Ew ne rewşparêz e, ne dewletperest e,

ne qanûnperest e. Ji bo wî pîyan ne ber-jewendiyê kesan; dewletî, neteweyî û her wekî din e. Gava pîyan ew bin, ew nikare bibe rewşenbîr, nikare bibe hişa-za, nikare bibe demokrat, nikare bibe maşparêz. Ku wisa be, iro li Tirkîyê "rewşenbîr" li qirikê ne. Vê çaxê kes ni-kare wan rexne bike û gaçincan ji wan bike.

Pirê wan "ji bo berjewendiyê nete-weyi" li şerî qirêj dînihêrin. Gaya ku li gelşan dînihêrin, pîvana wan ew e. Cudahiya wan, ji siyasetvanan nîn e. Iro si-yasetvanen tîr hemâ bûbêjin tev rewşparêz in, aligirê berdewamiya rewşa heyîne, lewma statukoperest in.

Digel van yekan, rewşenbîr ne wisan e; şoreşger e, di tojeva wî de guhêrin û dagerin her tim hene. Ew wîjdanê civakê ye, sînor û çeper li pêsiya wî/wê nîn in. Sînorê hêza xeyalî ya demokratik pir fireh e.

Çawa ku ji nav eivakan zû bi zû pêşawa (lîder) ranabin, rewşenbîr jî ran-abjn. Ji lew re rewşenbîri ne karê her kesi ye û her kes ji nikare bibe rewşenbîr.

Li dâwiye em vê ji bûbêjin. Ew ne xwêdî agahî ye, zanîn û agahîyan hil-diberîne û wan dixe xizmeta mîrovahiyê. Ji ber ku têkoşer e, ji ber ku ew cihanî ye.

## Supay Iran decêt Basûrê Kurdistanewe

BEKIR BAHOZ

**W**a diyar e êdî çarenûs wa dexwazet ko geli kurd hemîse ke şer û naxosî û pêkdadan bê bes nebêt. Eweta diway hêrişe yek le diwa yeke-kanî supay dagîrkeri turki bo ser başûrî Kurdistan; em çar supay welatêkî tîrî hawsê be çek û cibexaney qursewe hêris débatê sér xâkî başûrî Kurdistan.

Be pêy ew hewaleney ke hoyekanî fageyandin bilawîyan kîrdewê, le diwa hîreftey mangî gelawêj da, nizikey sê hezar serbazî ser be supay Iran û 200 maşenî serbazî hêrişekiyan bo ser barêgakanî Hîzbi Demîkratî Kurdistanî. Iran le nawçekanî jêr deselati hêzakanî Yeketi Niştimanî Kurdistan dest pê kirdi-we.

Supay Iran lem hêrişe da rû be rû hîç kam le hêzakanî başûrî Kurdistan nebowe, helbete şerî birakuji. Yeketi Niştimanî Kurdistan (YNK) û Partî Demîkratî Kurdistan (PKD), siyaseyi de-rewey layene kurdîyekanî başûrî Kurdistanî hênde lawaz kirdiwe ke hîç kâmiyan natwanin helwestêkî azayane û

Her ler bereyewe lêpisirawanî Iran rayangeyand ke YNK yan agadar kirdotewe ke lemew diwa supay Iranîs wekû supay Turkiya bo arezûy xoy û çî katê bixwazet hêris debate ser başûrî Kurdistan.

ew temha wîlatêk e ke detwanet be arezûy xoy yarî be çarenûsî geli kurd par-çeyey Kurdistan bîkat,

Her ler bareyewe lêpisirawanî Iran rayangeyand ke YNK yan agadar kirdotewe ke lemew diwa supay Iranîs wekû supay Turkiya bo arezûy xoy û çî katê bixwazet hêris debate ser başûrî Kurdistan.

Her dû layene deselatdarekey basûrî Kurdistan, YNK û PDK is te biri ewey dij be hêrişkey supay Iran rabiwestin û rî neden hêze derekiyan serbexoy xakî Kurdistan pê şel biken, destiyan kird be tawînbar kirdinî ye û her yekeyan hewlî da tawaneke bixate es-töy ewi tir.

Eger seranî kurd çaw be siyaseti heley xoyan da negîrinewe, ewa bêgûman başûrî Kurdistan debêt be gorepanî cirîdbazî hêzakanî supay Turk û Iran û ewesi lew nîwane da ziyanî pê degat, tenya gelî kurd e.



**KURDÎN** metropolan ji bo parastina hebûna xwe, xwe bi rôxistin dîkin. Yek ji van jî Zel-Der e. Ew saziya gundîlyen Zelkedêra (Sarıbaşak) navçeya Depa (Karakoçan) Xarpîtî ye. Komele, di 28'ê tîrmehê de li Taxa Yakacîka navçeya Kartalê vebû.

Serokê Komeleyê Doğan Uluç da xuyakîrin ku nîfusa Zeixedêrê ya li metropolî gihîşteye 2000'ê û dixwazin ku ji kurdîliya xwe, ji rastîya gelê xwe veneqetin. Uluç wiha dom kîr: "Jî bo ku bîyanîya bajare mezin û Jîyana qîrîj li me tesîfreke ne xweş neke û zaroğan me ji çand û hunera xwe haydar bibin, me ev komele ava kîr."



**MAYINA** Hêza Çakûç hate dirêjkirin. Partiya Refahê heta nehâibû iktîdarê, li dijî Hêza Çakûç bû, lê dema hate iktîdarê, bêdilîya Amerîkayê nekir; Ji bo ku destûra Hêza Çakûç ji meclîse bîstîne, Erbakan ci ji destê wî hat kir.

Roja 29'ê tîrmehê li ser Hêza Çakûç danışın çebû. Mebûsên ANAP'ê tevî danışına ji bo Hêza Çakûç nebûn. CHP, DSP û BBP li dijî Hêza Çakûç derketin û di eleniya wê de ray dan, lê bi raya parlementerên DYP û Refahê raya meclîse hate standin. Erbakan li ser wê yekê da xuyakîrin ku li gorî feyde û berjewendiyên Tirkîyeyê bîryar dane.

## NÛÇE

# Komîteya Çavdêriyê kete dû neheqîyan

**Armanca dewletê ew bû ku  
bi tewra guhnadanê wisa bike  
ku girtî dev ji rojiya mirinê  
berdin û bi paş ve gav biavêjin,  
lê belê bibiryarbûna girtîyan  
dewletê bi paş ve gav avêt û  
daxwazêñ girtîyan pejirandin.**

**D**i girtîgehan de, rojiya mirinê ya ku bû sedema mirina 12 girtîyan, bi têkilîdanîna heye-tekê ku ji ebûqat û nivîskaran pêk hatibû, di 27'ê Tîrmeha 1996'an de xelas bû. Demeke dirêj bû ku girtîyen gelek girtîgehan ketibûn greva birçîbûnê, lê dû re jî, hin ji wan girtîyan grevê vegerandin rojiya mirinê. Di rojiya mirinê de, ya ku 69 rojan dewam kiribû; 11 girtî, piştî ku di navbera heyet û girtîyan de peyman çêbû, girtîyek jî di riya nexweşxaneyê de can dan:


Aygün Uğur (63.), A.Berdan Kerimgil-ler (65.), İlginç Özkeskin (66.), Hüseyin Demircioğlu (67.), Ali Ayata (67.), Müjdîdat Yanat (67.), Tahsin Yılmaz (68.), Ay-çe İdil Erkmen (68.), Osman Akgün (69.), Hicabi Küçük (69.), Yemliha Kaya (69.), Hayati Can (69.).

Rewşa hin girtîyen ku vêga di nexweşxaneyan de radizên, zêde nebaş e, heta çend kes ji wan hê jî li ber mirinê ne.

Vê koalisyonê ya ku ji Refah û Doğru-Yolê ava bû, hat nehat pêşî imzeya xwe avête binê vê qetliamê. Girtî, ji bo ku ma-fen xwe yên insanan bi dest bixin, ketibûn rojiya mirinê, lê bi taybetî ji ber tewra Wezîrê Edaletê Şevket Kazan, di dawiya vê rojiya mirinê de 12 miriyêñ girtîyan ji girtîgehan derketin. Tewreke bi vî rengî di dema darbeya 12'ê rezberê de jî nehatibû dîtin.

Partiya Refahê, beriya ku were ser kar, her dem ji mafen insanan û ji çareseriya pirsgirêkan behs dikir. Pêşî Erbakan, dû re jî giregirêne wî her tim rexne dianîn li vê sistemê. Bi taybetî vê rojiya mirinê de, ji tewra Wezîrê Edaletê Şevket Kazan eş-kere bû ku, tu cudayıtiya Refahê ji parti-yen din nîn e.

Partiya Refahê ku xwe di bin perdeya misilmantiyê de vedişart, bi devê Kazan,



politîkaya xwe baş nîşan da. Beriya ku di girtîgehan de însan bimirin, Kazan digot: "Ez bawer nakim ku însan ji birçinan bimirin... Vêga xwarin depo kirine li ba xwe... Rêxistinê wan emir dane kadroyen xwe ji bo ku bimirin, girtî ne bi iradeya xwe hereket dîkin... Em gavekê bi paş de navêjin" û hwd. Baş tê zanîn ku Wezîrê Edaletê Kazan piştî ku bi MGK'ê re rû-nişt, li gorî tewra dewletê ya kevnare dîti-nen xwe da diyarkirin û çavêñ xwe ji vê qetliamê re girt. Di dawiyê de jî bi vê tew-rê bû sebeba mirina 12 girtîyen şoşerger.

Armanca dewletê ew bû ku bi tewra guhnadanê wisa bike ku girtî dev ji rojiya mirinê berdin û bi paş ve gav biavêjin, lê belê bibiryarbûna girtîyan dewletê bi paş ve gav avêt û daxwazêñ girtîyan pejirandin.

Di 27'ê Tîrmeha 1996'an de, di navbera girtî û heyetekê de ku ji ebûqat û nivîskaran pêk hatibû, saet li dora 23.00'an peymanek hate çekirin. Dû re navê vê he-yetê danîn Komîteya Çavdêriyê Girtîgehan. Di vê heyetê de nivîskaren mîna Yaşar Kemal, Zülfü Livaneli, ji ÖDP'ê Gençay Gürsoy, Ebûqat Eşber Yağmurdereli, ji CHP'ê Ercan Karakaş, ji IHD'ê Ercan Kanar û ji CHD'ê ji Ebûqat Mustafa Üçdere cih girtin. Piştî ku di navbera wê he-yetê û girtîyan de lihevhatin çêbû, rojiya mirinê hate qedandin.

Piştî ku daxwazêñ girtîyan bi peymane hat qebûkirin û rojiya mirinê hat xelaskirin, Şevket Kazan diyar kir ku peymaneke bi vî rengî nehatiye çekirin û girtî ji tîrsa xwe livbaziya xwe dane sekandin. Tê

zanîn ku Şevket Kazan heta rojiya mirinê xelas bibe gelek caran bi gotinêne rast, xwestibû raya giştî bixapîne, lê her xeb-dana wi ji aliye ebûqat û kesen xwedî agahiyan ve hate derewîkirin.

Li gorî agahiyênu ku gihîştin desten me, piştî peymana qedandina rojiya mirinê, girtîyen ku di rojiya mirinê de bûn di nexweşxaneyan de tedawîyê dibînin û li gorî daxwazêñ girtîyan jî, ji Girtîgeha Es-kişehirê girtîyen siyasi divê sewkî girtî-hen din bibin. Her çigas di çapemeniya tirk de zêde cih negirtibe jî, beriya ku rojiya mirinê xelas bibe, gelek kes û saziyên biyan dewleta tirk protesto kirin. Bi taybe-ti ji Parlementoya Ewrûpayê gelek mebûs, name û faks şandin ji giregirêne dewleta tirk re.

Di 31'ê Tîrmehê de jî civînek li Komeleya Mafen Mirovan bi besdariya gelek kesan li dar ket. Di dawiya civînê de Yaşar Kemal bû Serokê Komîteya Çavdêriyê Girtîgehan, Ercan Kanar bû Cigirê Serok û di heyeta birêvebirinê de jî Eşber Yağmurdereli, Mustafa Üçdere û Mihriban Kirdök cih girtin. Di dawiya civînê de hat xuyakîrin ku, wê ev komîte:

- bibe takîpkarê peymane ya ku di dawiya rojiya mirinê de çêbûbû

- ji bo ku jiyanâ girtîyan baş bibe di girtîgehan de ci pirsgirêk derkevin ji bo çareseriye bixe-bite

- wê lê bixe-bite ku sebebênu ku bûne se-dema greva birçîbûnê ya di girtîgehan Mereş, Erzirom û Bandirmayê de ku hê jî dewam dike, ji holê rake.

AYNUR BOZKURT

# Destana Memê Alan (1)



Roger Lescot

**R**oger Lescot, kurdologe bi nav û deng, ev nivisa li jérê ji bo pêşgotina Memê Alan nivisibû, ku wî bi xwe destana Memê Alan ji devê bîst dengbêjan guhdarî kiribû ú pişt re ew weşandibû. Weşanxaneya Avesta lê dixebite ku Memê Alan di demeke pir nêzik de ji nû ve çap bike. Em vê pêşgotina ku ji aliyê MAZHAR GÜNBAT ve ji fransizî li kurmancî hatiye wergerandin, bi hin sererastkiran pêşkêş dikan.

\*\*\*

Destana Memê Alan ji bo kurdan xwedî nirxekî neteweyî ye. Ji çiyayê kurd (kurddaxî) ta bigihêje Deryaçeya Urimiyeyê kesek tune ku, baş an xerab, qet nebe çend rêzan ji vê destanê nizanibe bistirê. Nav û deng û tesîra destana Memê Alan di ser tixûbênen Kurdistane re ji pêl daye. Guhertoyeke vê destanê bi ermenî ji heye ku analîza wê ji hêla F. Macler hatiye kîrin.

Tenê li herêmên ku zaravayê din ên kurdi (zaza, baba kurdi) tên axastin, ev efsane belav nebûye. Bi taybeti û ji ber egerên prestijê, mîrekên Botan vegotin û belavkirina destana Memê Alan li tebaya xwe qedexe kiribûn. Divê neyê ji bîr kîrin ku, Mir Ezînê Cizîri di çiroka Mem de mirovekî zêde ne şîrin e. Ji ber

vê yekê, di roja me de botanî hindik şas namînin dema ku yek ji çêlikên Bedirxaniyan, Mîr Celadet li ber wan digere da ku vê destanê jê re bistirê.

Di sedsala 17. de, dema ku Ehmedê Xanî hewl da ku bi nivisandina berhemek xwerû bi kurdi, kurmanciya xwe ya zîkmakî derfîne sewiyeya zimanekî wêjeyî, hingê wek babet, çiroka Memê Alan hilbijart. Di gel vê yekê, dema mesnewiya Xanî hate weşandin, her çendî dengeki mezin ji veda, wê tu caran cihê çiroka Memê Alan a gelêri negirt ku bi saya dengbêjê nexwende li her der belav bûbû.

Di vê rewşê de, du destanê serbixe-we derdi kevin pêşîya me; hem ji aliyê awir, şêwe û hem ji carinan ji aliyê na-verokê ve du destanê gelek ji hev ci-hê; Memê Alan a çirokbêjan û Mem û Zîna Xanî.

Efsaneyâ Memê Alan ji mîj ve ji hêla ewrûpiyan ve tê zanîn. Hê di 1890'an de A. Socin guhertoya pêşî amade kiribû. Di pey wî re ji, A. Von Le Coq (1903), Oscar Mann (1906-9) û Hugo Makas (1926) gelek guhertoyen (versiyonên) din ên Memê Alan derxistin holê. Dawî, li Êriwanê pirtûkek hate weşandin ku tê de sê guhertoyen din hatibûn komkîrin.

Tevî vê yekê, dema em weşanên ku

Piştî Siyamendê Silîvi, Memê Alan destana kurdî ya yekane ye ku muhtesemî tê de xwedî roleke mezin e û mira wê ji ne dîrokî, lê bi temamî efsaneyî ye. Dema li naveroka çirokê baş tê mîzekirin, gelek pirs di serê mirov de çedîbin piraniya wan ji bêbersiv dimînin, qet nebe bi van belgeyên lata niha hatine bidestxistin.

Li jorê navê wan diborin, dikin bin berçavka lêkolînê, dibînin ku yek ji wan bi tenê ji, ne li gorî dil e. Helbesta Socin zêde kurt e û gelek kîmasiyen wê hene. Heçî H. Makas ji devê yekê Mîrdînî berhema xwe amade kiriye û ev guherto ji kurtiyeke xerab e. Her sê guhertoyen di Antolojiya Êriwanê de cih digirin, ji aliyê ermeniyan ve hatine berhevkinin û zimanê wan ne xweş e. Ya heri hevgirtî berhevoka O. Mann e, ku di Mundart Der Mukri Kurden de ye. Lî belê, di vê de ji, kîmasî pir in. Bidestxistina teksteke baş a efsaneyeye kurdî, karekî gelek hesas e. Hunera dengbêj li ber hilweşînê ye.

Ew ên ku iro vî navî li xwe dikin, amatorê dengbêjiye ne. Yanê cu eleqeya van tune bi wan kesan re ku dengbêji ji bo wan meslekek bû û bi xwe di bin xizmeta mîr an ji serokeşîrekî de bûn. Ev dengbêjîn ku heta berî demeke nêzik ji hebûn, piraniya destan û stranen kurdî ji ber dizanibûn, di ser re ji eger car caran hin gotin nehatana bîra wan, xwedî wê qebiliyetê bûn ku, tavilê gotinê nû biafirînin.

Min Memê Alan ji nêzîkî bîst dengbêjan guhdarî kiriye. Piraniya wan destana Memê Alan bi tevahî nedizanîn. Çend kesan ji wan, cara duyemîn, tişteku berê ji birî dikirin, wek pexşan (nesîr) vedigotin. Lî kesî ji wan nedîkarî bi tevayî û bêkîmasî guhertoyeke destanê bîne ziman. Yekane çareya bidestxistina guhertoyeke biserûber û nesîkestî, ew bû ku, ji gelek guhertoyan, yeke nû ya têkelbihata pêkanîn. Tişte min kir ji, ew bû.

Min destana Memê Alan a ku ji hêla Miço ve dihate strandin, kir bingeh ji berhevoka xwe re. Jixwe Celadet Bedirxan ji alîgîre vê yekê bû. Min wekî guhertoya alîkar ji ya Sebrî sûd girt (îstîfâde kir). Min paragrafa li ser listîka Sêtrîncê ku tu kes baş nizane, ji dos-teki bi navê Stranvan girt. Ev epîzot li ser daxwaza min di hejmara 36'an a kovara Hawarê de hate weşandin.

Miço Memê Alan ji bavê xwe girtibû, bavê wî ji ew ji kurdeki Behdinanî fîr bûbû. Ew ji Eşîra Berazî ya li Başûr e. Kîmanîyeke Miço ji sistbûn û xwarbûna zimanê wî ye. Kurmanciya wî ew çend di bin tesîra erebî û tirkî de maye ku hem ji aliyê şêwe, hem ji ji aliyê zelaliya xwe ve, ji kurdi bêhtir dişibe zimanekî din. Lî belê, ev guherto her çiqas ji aliyê wêjeyî ve zêde ne xurt be ji,

ji guhertoyen ku li Suriyê tê zanîn heri xemlandi û têkûz e. Ji ber vê yiye ku me ji nav giştan ew hilbijart.

Di pêkanîna vê berhevokê de geştiş ji ji guherto ya Sebrî hatine girtin ber ku zimanê Sebrî yê heri bedewir. Heçî, çavkaniya epîzota beşa listî Sêtrîncê, herêma Serhedan e ku hdi aqarê tixûbê Iran û Tirkîye, hem ji Rûsyâ û Tirkîye wîsa tê binavkirin. Ur bê ditin ku, di guherto dengbêj Serhedan de, ev beş ji yên deveren (zindîtir) e û xwedî xemlî û bedewiyev berbiçav e. Kîmasiyen guherto ya Mîmî Alan a Serhedan ji hene, lê tevîne yekê, cihê daxê ye ku me nekarî teva ya çiroka ku ji aliyê dengbêjîn vê hemê ve te vegotin, bi dest bixin.

Piştî Siyamendê Silîvi, Memê Alan destana kurdî ya yekane ye ku muhtesemî tê de xwedî roleke mezin e û mira wê ji ne dîrokî, lê bi temamî efsaneyî ye. Dema li naveroka çirokê baş tê mîzekirin, gelek pirs di serê mirov de çedîbin û piraniya wan ji bêbersiv dimînin, qet nebe bi van belgeyên ku niha hatine bidestxistin.

Eger li ser tesbîtkirina dîroka pêknîna vê berhemê lêkolîn têne kirin tişte balkêş ew e ku kes bi giştî dîrabirdîya wê nabe serdemekê zêde di Hemû guhertoyen di destê me de, Xanî ji her wiha, di nav hevgirtinekê ne ku, Mîr ê ku Qesasê Mîm e, Mî Zeyneddin (bi şeweyê gelêri: Zeyd an ji Zengîn) ê kurê Mîr Ebdal an ji Ebdal e. Tenê di guherto ya Miço de na wî Mîr Ezîn (şeweyê gelêri: Ezzedîdî ê kurê Mîr Tacîn (Tajdîn) e.

Besa Şerafname ya li ser Mîr Ebdal behsa du heb Mîr Ebdalan dik. Yek ji wan, neviyê Xafîd bin Elwelîd û vî kesî mîrekiya Finikê ji birayê xwendîr standiye. Xuya ye ku Mîr Ezîdîne kurê vî ye, wekî ku wî tu caran li sî Cizîrê hikum nekîriye. Der heqê mî Ebdalî din de ji tu agahîyen kifşker nî hatine bidestxistin, lê belê, em ji Şerafnameye fîr dibin ku, kurekî wî ye navê Mîr Ezzedîn an ji Mîr Ezîdîn hûbîye (Rûpel 162, rîz 3), ku ev Mîr 706/1393 de çûye Mîrdînê ji bo xwe bispîre Timûrleng û disa vege riya emareta xwe Cizîra Botan. Hingê kumanecî ku serî li ber Timûrleng rakîn ye û Timûrleng dixwaze wi ceza bik xwe dispîre Mîr ji bo ku wî biparêze.

Timûrleng vî zilamî ji Mîr Ezîdîn dixwaze, lê Mîr daxwaza wî nayin

i ser vê yekê, Tîmûr digire ser Ci-  
Mîr direve, xwe digihine Dihê, li  
trê bi sofityê emrê xwe temam di-  
Zefername, weş. Tauer. Rûpel.  
150)

şî du salên din, Mîr Ezdînekî din,  
Kan Evdal, bi alîkariya pêxwasân  
birayê xwe dide kuştin û heta  
jan, sala nivîsandina Şerefname-  
anê sed sal beriya pêkanîna berhe-  
Mem û Zîn, ew li ser Cizîrê hikum  
Lê belê, di tu qeydiyê dîroka  
de, em rastî mîrekî Botan ê bi na-  
sydîn nayê.

lîrê ku Miço di çiroka Memê Alan  
nekî Ezdin bi nav dike, xuya ye ku  
yi wan her du Mîr Ezdinan e ku na-  
tan di kronolojiya dîrokê de dibore.  
çê rewşê de jî, berî giştan, Mîr Ezdî-  
in dijberê Tîmûr bû, tê bîra me. Ta-  
virina Cizîrê ji aliye rojavahîyan ve  
stî beşa dawî ya destanê de tê vego-  
hîyar e ku serpêhatiya êrişâ tolhil-  
î serdarê Moxolan bi xwe ye.  
uman, em nikarin vê hîpotezê bis-  
en tu delîlên saxlem. Tenê di guher-  
kê de mîrekî me, wekî Mîr Ezdin tê  
çvkirin û ev jî ne kurê Mîr Evdal, lê  
Mîr Tacîn e. Wekî din, bi iñfîmale-  
nezin, ew navê lehengékî pir kevn-  
a, lê belê, postê şexsiyetekî dîrokî lê  
ehe. Veguherîna qralê ferîsteyan (ec-  
jin) ser dirûvê Xizir, ku di vê destan-  
e jî cih digire, nimûneyek e ji bo vê  
herîna analogik. Gava em baş bala-  
n didin çirokê, her tim intîbahek bi  
fe çedibe ku ew rastî gelek mudaxe-  
sin hatîye û di encamê de bûye çiro-  
e modern û ıslamî.

i xeynî Mîr, dirûvê Memê Alan jî  
ne zelal e û gelek pirsan di serê  
de çedike. Her çendî Mem pîrî ca-

# MEMÊ ALAN



Berga Memê Alan ku wê ji aliye  
Avestayê ve bê weşandin.

ran kurtkirina navê Muhemmed be jî,  
Alan li Kurdistanê ne navekî xisûsiyê  
wisa navdar e. Ev nav tenê li nav Eşre-  
ta Swêsnîyan heye. (Herêma Wezne  
Zerdeş, Ansiklobediya Islam, Cild IV,  
rûpel 196.. 197). Wekî navê  
deveran jî, ev peyv ji bo  
aqarê navbera Silêmaniyyê û  
Banê tê bikaranîn. Li aliye  
din, çemê ku ji Kalifan ber bi  
Rewandizê diherike wekî  
Alûna tê bi nav kirin.

Pline (dîroknivîsekî romanî) jî beh-  
sa êleke bi navê Alûna dike ku li derdo-  
ra eyî çemî rûdinişt.

Memê Alan bi giştî hem wek xwar-  
ziyê qureyşîyan tê pêşkêskirin, hem jî  
qralê weletekî nehêni yê ku li Mexribê  
ye û paytexta wî jî bajarê Mexrib e. Di  
guhertoya O. Mann de, Mem mîrê Ye-  
menê ye, li gorî Xanî jî ew ji malbate-

dirûvê Memê Alan jî zede ne  
zelal e û gelek pirsan di serê  
me de çedike. Her çendî Mem  
pîrî caran kurtkirina navê  
Muhammed be jî, Alan li  
Kurdistanê ne navekî  
xisûsiyê wisa navdar e. Ev  
nav tenê li nav Eşre-  
ta Swêsnîyan heye. (Herêma  
Wezne Zerdeş,  
Ansiklobediya Islam, Cild IV,  
rûpel 196.. 197). Wekî navê  
deveran jî, ev peyv ji bo  
aqarê navbera Silêmaniyyê û  
Banê tê bikaranîn. Li aliye  
din, çemê ku ji Kalifan ber bi  
Rewandizê diherike wekî  
Alûna tê bi nav kirin.

ke esil a Botan e. Dema ev rewşa bajâ-  
rê Mexribê ji dengbêjan tê pirsin, bi  
giştî nikarin bersivekê bidin. Tenê çend  
kes ji wan, bajarê Mexrib li keviya ken-  
dava Îskenderiyeyê bi cih dîkin ku bi  
xwe nizanîn Îskenderiyê jî tam li ku di-  
keve. (Hawar, hejmar 6 rûpel 10).

Li vir tiştekî din ê ku divê bê diyar-  
kirin ew e ku, Mem ne tenê Mîrê Mex-  
ribê, lê her wiha ew qralê kurdan, ser-  
darê Mîrekiya Botan e. (O. Mann. rûpel  
105). Ev jî bi xurfi nişan dide ku, tu  
agahîyen ta niha hatine bidestxistin, tê-  
rê nakin da ku hîpotezek li ser binyata  
vî lehengî bê formulekirin. Eger bi riya  
danberhevkirinê em bixwazin li pê-  
wendiyekî bigerin di navbera vê efsa-  
neyê û çirokîn din ên rojhîlatî de, hin-  
gê divê nevê emê pala xwe bidin

nivîseke Chares Mytilene û nivîsîn  
Thaalibî û Fîrdewîsî ku van kesan ji çî-  
roka nivîskarekî greki, bi riya têginê (terimê)  
analojik guhertoyeke pir be-  
revajîkirî ji nû ve afirandine. Di nav  
wan guhertoyan de ya herî girîng çîro-  
ka Chares e, em dixwazin li vê derê wê  
pêşkêş bikin. 'Rojek ji rojan du bira hebûne,  
navê birayê mezîn Hystaspes, yê  
biçûk jî Zariadres bûye. Tê gotin ku ew  
ji Aphrodite û Adonis çêbûne. Hystas-  
pes serdarê Medya û welatê din ên li  
jîr bû. Zariadres jî ji bakurê Deryaçeya  
Hazar bigire ta bigîhîje Çemê Tûna hi-  
kum dikir. Ji vî çemî û ber bi jor ve  
wekî Welatê Marathates dihat zanîn û  
serdarê vî welati jî Homartes bû. Bi na-  
vê Odatis, keçeve vî qralî hebû. Dibê-  
jin, şevekê Odatis Zariadres di xewna  
xwe de dibîne û dil berdidê. Li aliye  
din, eyî tiş tê serê Zariadres jî. Aşiqê  
hev û din dibin û her du jî ji xewna xwe  
re sadiq dimînin. Odatis, li parzemîna  
Asyayê jina herî bedew bû. Zariadres jî  
téra xwe çeleng bû.

Zariadres jî bavê keçikê re qasidekî  
dişîne ji bo keça wî jê bixwaze. Lê be-  
lê, qral, vê daxwazê qebûl nake. Ji ber  
ku qral bêkur bû, dixwest keçâ xwe bi-  
de yekî ji malbata xwe. Rojek ji rojan,  
bavê Odatisê ji bo daweta keçikê, hemû  
mirovê xwe, mîr û giregirêne welêt li  
hev kom dike. Feqet heta hingê ji kesi  
re behs nekiriye ka wê keça xwe bide  
kê. Pişti ku mîvan dixwin û vedixwin,  
Homartes deng li keça xwe dike û jê re  
dibêje: Odatis, keça min em işev dawet-  
ta te dîkin. Li dora xwe baş binêre û li  
mîvanan hûr be. Dû re piyanekî ji zêr  
hilgire, tije şerab bike û bide destê xor-  
tê ku dixwazî wî bikî û bibî jina wî.

WÊ BIDOME

## Mirina birûmet

ELALETİN YÖYLER



Küstîna kesan di nav çar dîwaran de, qet  
li tu deverê cihanê nehatiye dîtin.  
Berxwedana dîlên şoreşger û malbatê  
wan û kesen xwenas û welatparêz, ji du  
mehan borî û berdewam kir. Şoreşgeren kurd  
û yên tîrk (dîlên zîndanan) jî bîryarên pir bi  
mîrânî danîbûn rojeva xwe ya şoreşgerî. Bi  
slogana "An mirin an serkeftîn"ê birçibûna  
xwe ya ber bi mirina bi rûmet ve, meşandin.

Kesen xwenas girîngîya vê bîryarê  
dizanibûn. Lewre dîroka şoreşgerîtiyê  
dizanibûn.

Lê dewletê jî her tim êrîş dibire ser mal-  
batên girtîyan û kesen xwenas. Yekî rojekê  
negot ev jî mîrov in û wek her kesî mafê wan  
û jîyanî heye. Digel van êrîşen dijwar û nîjad-  
perest û hovane jî, malbatan, komaleyê  
mafê mîrovân, rewşenbîr û nivîskaran û xwe-  
nasan dîlên li girtîgehan bi tenê nehiştin û li

cem wan cih girtin û xwestin ku dengê xwe  
bi cihanê û dewletê bidine bîhîstin. Ji bo ku  
xort û ciwanê wan nemirin.

Lê pir heyf û pir mixabin ku ji berpirsîn  
dewletê tu kesî nexwest ku dengê dayikê  
şoreşgeran bibîhîze û zarokê wan dayikê  
dilşewîtî, ji mirinan rizgar bikin; hetanî ku  
mirinan dest pê kir.

Ciwanan ji mirinan rizgar nekirin, bi ser de  
di nav rojîn mirinan de jî wan berpirsîn  
nîjadperest, li wan girtîyan di ber mirinê de  
gef xwarin û gotin "Me pir tiş daye wan, eger  
ew birçibûna xwe nedîne rawestandin wan  
tişten ku me daye wan emê ji wan bistînîn."  
Ev jî gotineke gefxwarinê û dijminahîyê bû ku  
dihate gotin.

Lê ne gefxwarin bi tenê, her wisa jî digotin:  
"Girtî derewan dîkin. Ji birçînan namirin,  
lewre di ber rojîgirtina xwe de, ji xwe re  
xwarin li cem xwe civandine û dixwin."

Belê bi rastî bêbextiyeke pir mezin e ku ji  
aliye wezîriya dadê ya rejîmê ve tê kirin.  
Lewre me mîrovân tu dermê di jiyanâ xwe de  
ne seh kiriye ne jî dîtiye ku mîrov ji têrî  
bimirin. Ev e ji nû ve ez li vî welatî ji rejîma  
paşverû dîbihîzim ku ew dibêjîn "ev kes hem  
xwarine hem jî ji birçînan mirine." Ev bobex-

tana hanê wekî gotina bapîrên me kurdan ku  
dibêjîn: "Ga derdixin golikan li ber dixin."  
Çawa ga bi golik derew e wisa jî gotina wana  
"nanxwarina rojîgiran" jî derew e. Lewre me  
û kesen cihanê bi hev re dît ku, wan  
xweşmîrên xudan baweriyan mîrovahîyê, yek  
li pey yekî dinê bi mirina mîrânî û şoreşgerî  
mirin, hem jî ji ber berxwedana bêxwarin.

Yek ev bû bobextanê wan. Ya duduyan jî,  
digotin: "Emê têkîlî bi wan bikin, bi êrîşen ji  
bo rawestandin û vemirandina berxwedanê  
wan ên rojîya mirinê." Lê digotin "Li cem girtîyan  
di ggirtîgehan de çekîn giran hene wê  
me bikujin." Ev jî bobelat û bobextana herî  
mezin bû ku dikirin.

Bi zañna min ev jî, ji bobextaniyê pîrtir  
plan bû dihate amadekirin; ji bo pêşerojê re  
ku di zîndanan de bi sedan kesen girtî bukujin  
û bibêjîn: "Wan bi çek, êrîş anîn ser leşkeren  
me û hatin kuştin."

Dîsa jî gotinekî bapîrên me ku dibêjîn:  
"Çira virekan hetanî sibê naşuxule". Di  
dawîyê de ez dixwazim wiha bibêjîm, Xuda  
dijimin virekan e û yê mîtingerên bi navê olê  
ye. Mirina têkoşeran û lehengan, mirinekî pir  
birûmet e. Bira dilovaniya Xuda li ser wan be,  
serkeftin her ya mezlûman e.

# Alp Urungu kî ye?

**Broşûrek ji aliye Wezîrtiya Karêñ Hundirîn a Tirkîyeyê ve bi awayekî fermî (resmî) ji hemû walîtiyan re hatiye şandin. Biryara şandin û mêmüya wê ev e:**  
**29.05.1996 û B 650 HJD 000 0000/10 Di vê broşûra rengin û çar rûpelî de, li ser koka kurdan, rengên kesk, sor û zer hatiye sekinandin. Kurdan wekî qebileyeke tirk dide dide nîşandan.**

**E**m kurd, di tariyê de bi dest-pelkê lê dixebeitin ku hişkegi-reyên der barê diroka xwe de vekin. Di rastiya xwe de belki ew gozegirê bin, lê hêzên serdest ew kirine hişkegirê. Jixwe ev yek qedera gelên bindest e.

Dirok kareki zor, içar diroka kevna-re! Em lê dixebeitin ku perdeyêni li ser diroka me ne hilfinin, hêzên serdest hem li me dikine tarî ku em riya xwe nefesi-linin û hem jî delîl û belgeyên ku hene an ji holê hiltînin an jî wan tehrîb dîkin.

## Kurd: Gelekî ku nayê parîkirin

Ev aliye gelêye ye. Li aliye din, bi navê xebatêñ zanistî (ilmî), serwer û berdevkêñ wan bi riwayetan derdi kevin pêsiya me. Li gorî wan, kurd zarokêñ şeytan in, ji cinan peyda bûne, geleki lénîfirbûyî û lenetkîr ye, bi koka xwe ereb in, tirk in, ecem in û hwd.


Içar em, bi taybeti jî di berhemêñ ku teza fermî ya kemalî diparêzin de, rastî wan sosretan têñ. Pirtûkek ku tê de tê îdiakîrin ku kurd ji nesla şeytan in jî, ji aliye Serokatiya Karêñ Diyanetê ya Tirkîyeyê ve ji bo xwendinê tê tesdiq-kirin û li muftîtiyan tê belavkirin.

Li vir ez naxwazim li ser naveroka pirtûk û berhemêñ bi wî rengî biseki-nim. Lê em dê li ser broşûrekê rawestin. Ew ji aliye Wezîrtiya Karêñ Hundirîn a Tirkîyeyê ve bi awayekî fermî (resmî) ji hemû walîtiyan re hatiye şandin. Biryara şandin û mêmüya wê ev e: 29.05.1996 û B 650 HJD 000 0000/10.

Di vê broşûra rengin û çar rûpelî de, li ser koka kurdan, rengên kesk, sor û zer hatiye sekinandin. Digel van cih dane gotareke M. Kemal Ataturk. Diyar dîkin ku ev ji destnivisêñ M. Kemal a ji pirtûka Prof. Afet Inan "Medeni Bilgiler" (Agahiyen Şarezayî) hatiye veguhastin.

Me divê ku em der barê Prof. Afet Inan de jî çend gotinan bibêjin. Ev kes mîmareki Teza Diroka Tirkî ye, rîberiyê jê re kiriye û gelekî jî nîzîki Ataturk bûye.

Bi gotarê tenê nemane, li binê xerî-teya Tirkîyeyê ku tê de ala tirkî jî heye,



Di broşûre de nexşeye koça kurdan ji çekirine. Li gorî wan kurd ji çembera ku hatiye xêzkin bar kirine û ji hev belav bûne

cih dane wecizeyeke Ataturk. "Diyarbakır'lı, Van'lı, Trabzon'lu, İstanbul'lu, Trakya'lı ve Makedonya'lı hep bir irkin evlatları, hep aynı cevherin damalarıdır" (1932). Wergera wê: Diyarbekirî, Wanî, Trabzonî, Stenboli, Trakya'yî û Makedonyayı tev zarokêñ nîjadekî, rehîn eyñî cewherî ne.

## Her kes tirk e ew qas

Em vê jî bibêjin ku ev wecize li Amede jî, li ser riya ku mirov dikeve bajêr heye.

Di broşûre de, di bin navê "Yeşil-Sarı-Kırmızı Renklerin Türk Kü-

**Dibêjin ku Alp Urungu Abîdeyê Elegeşê daye amadekirin û li serê daye nîvîsandin ku ew "Xanê warê kurdan e"**  
**(kurt elinin hanı). Bi kurtî, Alp Urungu tirk dipijirînin û pê re jî tirkbûna kurdan. Bi ya min, divê pirs ev be; ji bo kurdan.**

**Bi rastî ew kî ye, kurd e an na.**

tür ve Tarihindeki Yeri" (Cihê Rengê Kes, Sor û Zer di Çand û Diroka Tirkî de), tê îdiakîrin ku tirkan ji dema Goktirkan ve ev reng bi kar anîne. Pişte re dibêjin ku selçûqî û osmanî di warê leşkeriyê de ev reng, wekî rengên al û direws an (sancax) bi kar anîne.

Ji bîr nekirine, behsa Newrozê jî kîrine. Ji bo wê jî nimûne dane, bi navê "Çağdaş Uygur Resim Sanatında Nevruz" (Di Hunera Wênesaziya Hemdem a Uyguran de Newroz). Ji bo peyitandina (ispatkirina) tirkbûna kurdan ji belge pêşkêş kirine. Wekî Abîdeyê Elegeşê, Şerefhan, zanyarê macar Gyula Nemeth. Bêawarte (bêistisna) ez di hemû berhemêñ ku kurdan wekî qebileyeke

tirkan didin nîşan, leqayî Abîdeyê Elegeşê hatime. Dadixuyîn ku ew, pişte zayînî de sala 650'yan de hatiye nîvîsandin û ji aliye M. Radlof ve di sala 1897'an de hatiye deşifrekirin.

Tê de behsa Alp Urungu tê kîrin. Di bîjîn ku Alp Urungu abîde daye amadekirin û li serê daye nîvîsandin ku ew xanê warê kurdan (kurt elinin hanı) e.

Der barê Alp Urungu de ji çavkani-yen tirkan ez hînî gelek agahîyan bûm. Li virê pêwîsti bi dubarekirina wan nabînim. Bi kurtî, Alp Urungu wekî tirk dipejirînin û pê re jî tirkbûna kurdan.

Bi ya min, divê pirs ev be ji bo kur-

avakîrin ku ew tirk bûn, lê rajêrêñ wan kurd bûn.

Di çirokêñ kurdî de wekî Rostemê Zal, kurd xwe ïranî didine nasandin. Heta gava dixwazin hev nas bikin vê pîrsê ji hev dîkin: Tu tûranan ïranî yi?

Em bas dizanin ku çiroka Rostemê Zal ji koça tirkan a ji Asyaya Navîn kevtir e. Kurd û tirk ji berê ve hev nas dîkin û bi hev re ji ceng kirine. Em van mînakan dikarin dirêj bikin, lê bi ya me ji bo ronîkirina mijarê têra xwe mînak hatin dayîn.

## Hebûna kurdan? Kê got?

Jixwe broşûre ji bo peyitandina tirkbûna kurdan hatiye amadekirin. Her çendî Süleyman Demirel û Erdal İnönü li Amede gotibûn "Em hebûna kurdan qebûl dîkin" jî, "tirkbûna kurdan" li cem rîveber û rayedarêñ dewletê ber-dewam e. Siyaset neguheriye.

Amadekarêñ broşûre li ser koça kurdan a dîrokî jî agahî dane. Li gorî wan kurd ji Asyaya Navîn, ji der û dorêñ Gola Baykalê, Çiyayêñ Sayanê û Çemê Orhûnê bar kirine û berê xwe dane Balakanan û heta Macarîstanê çûne.

Nîvisa xwe jî em bi çend gotinan bî-qedîmin. Divê dîrokvanêñ kurd bi bêhnfirehî û bi awayekî zanistî lê bixebeitin ji bo ronîkirina diroka kurdan. Guhêñ xwe nedîn tiştîn bêhîm û eletewş. Ji bo me metoda zanistî gere rîber be. Ne ku em rabin li hemberî êrişan xwe bixin rewşa parêziyê û li gorî asta (sewiye) xebatêñ wan bersiv bidine wan. Xebata zanistî, tiştekî cidi ye û ji nîşen ayendê re dimînîn.

ZANA FARQÎNÎ



● 5.8.1895: Friedrich Engels cü ser dilovanlyा xwe.

● 8.8.1945: Dewletê Yekbûyî yâni Amerikayê (DVA) di Şerê Cihane yê Duyemîn de, li hemberi Japoniyayê carâ yekemîn bombeya atomî bi kar anî. Weli le zanîn bombeya atomî Albert Einstein icat kîr. Amerika yê carâ yekemîn bombeya avete Hiroşingayê. Pişî se rojan di 9'ê gelewê jê de Amerikayê bombeya duymîr avete Nagazaktyê, bî dû vê bombevî Japonya teslim bû. Di encama her du bombevyan de nezîk sed û pêncî hezar mîrîn, bî hezaran jî seget man.

● 9.8.1992 Rojnamevare rojnameya Özgür Gündem Hüseyin Deniz li Ceytanînara Ruhayê, ji aliyê Hîzbulahê ve bi qesta kuştîne hate guleba-

ran kirin. Hüseyin pişî 48 saetan li Amedê cü ser dilovanlyा xwe.

● 9.12.8.1925: Rejîma kemalist gelîfameke din li hemberi kurdan li Raman ji Reşkolanê pêk anî. Pişî Serhildana, Şex Seid dewleta kemalist li bo ku car din serhildanî çenebe, berê xwe da kurdan û dest bi getlîmî kir.

● 10.8.1920: Pişî Şerê Cihane ye Yekemîn-kî dewleta osmanî têk cü mecbûr ma Peymanâ Sevrê qebûl bike. Di wê peymanê de-li gorî madeya 62 û 64'an, matî kurdan heye ku deyleteke serbixwê avâ bike. Lî pişî ku dewleta lîrîk ava bû, rejîma kemalist hebûna kurdan înakir kîr û Peymanâ seyrê nepejîrand.

## AWIR

# Prof. Walid Xalidî: Kêşeya kurdî bi riya leşkerî çareser nabe

**P**rofesor Walid Xalidî zanyare kî filistîni yê. Ew xebatê xwe li Enstitubo Filistinê û Navenda Lîkolinêni ji bo Rojhilatâ Navîn a Zankoya Harvardê didomîne. Di 26'ê tîrmeha 1996'an de, di beşa duymîn a rojnameya Turkish Daily Newsê de hevpeyvînek bi Xalidî re derketîye. Lê nivîskarê rojnameyê Ugur Akîncı pergaleke li gorî dilê xwe daye hevpeyvînê û gotiñen wî di şîroveyen xwe de-xeniqandine. Nivîskarên yê rojnameyê dema kesê ku pê hevpeyvîn kirine tiştîn li dîrveyî bîrdoza fermî bibêje, her tim vê şeweyê bi kar tînîn.

Bi qaşî ku ji nivîsê tê fêmkirin, ew rexneyen di cih de li dewleta tîrk digire. Sedema ku nivîskar van rexneyan diweşîne jî geleki balkêş e. Nivîskar dibêje ku kalikên wî li dijî osmaniyan serî hilnedane, lewre ew dîvê rexneyen wî li ber çavan bigirim. Nêxwe kesen ku kalikên wan li dijî osmaniyan rabûne, ci rexneyan bikin jî, ji aliyê nivîskarên vê rojnameyê ve li ber çavan na-yen girtin.

Di nav agahiyêni li ser kalikên Prof. Xalidî de, tiştîkî ji bo me kurdan geleki girîng ji heye. Apê bavê Prof. Walid Xalidî, Yusuf Diya-uddin Paşa el-Xalidî ku di sala 1877'an de ji Qudsî dikeve meclisa Osmaniyan, weki nivîskarê Ferhenga Kurdi-Erebî ya yeke-



Prof. Walid Xalidî

mîn hatîye rîdân, lê mixabin ji billî vê rîdânê tu-agahî cih nagîrin di nava nî-vîse de.

Prof. Xalidî der barê kêşeya kurdi û PKK'ê de tiştîn balkêş dibêje. Ew dide zanîn ku PKK ne rîexistineke terorîst e û vê yekî ji wiha şîrove dike: "Li Tirkîyê kêşeya etnîkîango kêşeya çand, ziman û nasnava kurdan heye û ev kêşê ji bi riya leşkerî çareser nabe." Zanyarê filistîni dipejîfîne ku li lî êrdîma ereban ji kêşeyen hindikahiyan hene û dibêje: "Lê qet nebe naşnava wan ne-hatiye paşçavkirin."

Ew wiha didomîne: "Ji boçareseriya kêşeya hindikahiyan weki gava pêşîn, naşîna hebûna wan pêwist e, lewre ji dema hûn (tîrk) qala terorizma PKK'ê dikip, ez li dij radibim."

Prof. Xalidî li ser pêwendiyen tîrk û ereban ji hin nîrxandinê dûri îdeolojîya fermî dike. Li gorî Xalidî, dema pişti 1923'yan Tirkîyê berê xweji Rojhilata Navîn vegerândîye Rojava, dilê ereban şîkînandiye. Her wiha ji bo dema iroyîn jî ew diyar dike ku Tirkîye ava çemân weki çekêbi kar tîne; li hêla din bendavênu ku li ser Dijle û Ferat ava dibin jî çavên welatê ereb ditîrsînin. Bi nêrîna zanyarê filistîni, peymanâ Tirkîye û İsrailê, hewldana perçiqadina Suriyeyê ye di navbera du hêzan de. Her wiha ew dijî zanîn ku Suriye ji bo İsrailê pir girîng e.

SAMI BERBANG

## CAVDÊRÎ



MİRHEM YİĞİT

### Dr. Cemşîd Bender: alîm û lêkolînerê bicesarêt

Dîrok; temen, bîr û hişê neteweyî ye. Neteweyeke bêdirok, bêhafîze ye. Xelkê bêdirok hev nikare de meke dirêj bigire, zû belav dibe û roj tê winda dibe. Dîroka neteweyekî cendî Jawaz û qels û netewe ji cendî jî dîrokâ xwe bêxeber be, ew cendî hemîvelatî û rûniştvanî netewe jj, ji hev re bêtifaq dibin û nikarin bêne ba hev. Bêtifaqî, nêxweşî û dîjmînê-zehf mezîn e. Dermânê vê nezîşeyî û çekê li hemberê vi dîjîmin, qewînîn-û kûrkirina zanebûn û mejîyê dîrokî ye.

Xêlkê-bêtârix, mîna mîrovê bênav e. Kesîn-bênav ji nînas e û di nav listeyâ navan de nîvî wî tune: Mîrovê dejenerebûyi û pûc e û li ser riya mesexbûn û nemanî ye. Neteweyâ bêdirok, weki malê mîratê ye. Heçî tê qismekî ji xwe re cûr dike û heskekê ji xwe re lê dixe. Dîjîminen me dîroka me seraqt veşartine û dest danîne ser belge, ewraq, nîvîş, kitêb û her cure nîvîşen li ser me. Bi-gotinê din em ji dîrokê gut kirine. Qutkîrina ji dîrok jî bêguman qutbûna ji jîyanê û qutbûna ji însen e. Çewt û tersê xwe ketin û biyanibûna ji xwe ye.

Em iro ji doh. hisyartir in û em ji êdî bi buha û nîrxên dîrokê hesiyane. Edî dîroka xwe em bi xwê dîjînîsin û ew zemanê ku me xwe bi rî û alîkariya qelemîr biyanî nas dikirin li dû me dimîne. Li ba kurdan edî hismendîyeke dîrokî çedibe. Kurd edî ne bi çav û hişê berê, belê bi çavekî nûhtîr û ji yê hetâ niha cihetîr li Hesenkêfe, li Seraya Isheq Paşa û xerâbe û-wêrâneyen Ciyyâyê Nemrûdê dinêrin.

Salen pişti 1990'ı nemaze her du salen nav 1990-1992'an li bakurê-welat û li Tirkîyeyê li ser kurdan, dîrok, edebîyât, folklor û kultura kurdan, zêdeyî 200 kitêbî hatîne nîvîsandin. Li vir faktore handan û teşwîkar bêguman tevgera rizgarîwazî ye. Li dîrveyen wîlêt jî gelek merkezen nû yên kurdolojiyê vebûn.û wodîbin. Tîşî ku dilê mîrov pê xwes dibe, lîkolinêni lêkolinê û dîroknîvîsen kurd in. Heta berî bi çend salan, em bibêjin berî sâla 1990'ı rewşenbir û şexsiyeten me ji hev bêxeber bûn, hev nas nedîkir. Me nîzânîbû ku dî nav me de kapasîyen ew cendî, bikêrîhî û hêja hene. Tevgera rizgarîwazî û weşan û çapemeniya neteweyî, Konferansên YRWK û Enstituya. Lîkolin û Zanistê li Berlinê û bi taybet Televîzyona Medê, rolên sereke listin ji bo ku em alîm, zana û xwendayen kurd nas bikin.

Em iro ji nîzîk ve zanîn û bi agahdarîyeke temam dibînîn ku bi dehan akademîyenê me çebûne û li ser dîrokê, hem ya berî zayînê û hem ji ya pişî zayînê, kar dikin. Em di kovar û rojnameyên kurdi de meqale û lêkolinêni wan dixwînîn, di konferansên cur bi cur de dibin guhdarê dengê wan û ji Televîzyona Medê li wan temaçe dikin. Di nav alîm û lêkolinêni me de ku em bi gişkan serbilind in, em pesnê xwe bi wan didin, çavên me ji wan ziwanê û gelê kurd geleki hêviyîn mezîn ji wan dike.

Dr. Cemşîd Bender, di hevpeyvîneke xwe de di roja 18.5.1994'an de ji Rojnameya Özgür Ülke re wiha dibêje: "Kesê dîroka kurdan nas dike şoke dike, mîna ku ji darekî bikeve dimîne ecêbmâyî. Lêkolinêni li ser kurdan ne bi tepe alîmîn, lêkolinê, belê gelê kurd bi xwe jî dîbehîsne, şas û ecêbgirtî dike."

Li gorî Dr. Cemşîd Bender kîmanîya beşek dîroknîvîsen kurd ew.e ku, pişta xwe didin "5-6 berhemîn ku berî bi 50-60 salî hatîne nîvîsandin". Her wiha di meseleya pîydekîrin û peyketina serçavîyan de li gorî Bender "mêhefîzîkî û keslanî heye. Ev ji nebaş e.û ne rast e." Dibêje: "Dîrok wiha nayê nîvîsandin. Dîroka wiha bê nîvîsandin bi kêrî tiştîkî nayê."

Em ji bo Dr. Cemşîd Bender û giş dîroknîvîs û lêkolinêni me serkeftinê dixwazin û em û pirtûkhaneyâ kurdi em bi hev re li bendeyî berhemîn wan ên nûne.



Yusuf Diya-uddin Paşa

# 'Ne bitalûke ye ji me ye, lê nezan e!..'



*i çapemeniya tirkan de  
cara yekemin we li ser  
MED TV'ye nivîsand;  
li ser vê nivîsa we  
reaksiyon çêbûn?*

■ Gelek kesen ku ew nivîs  
xwendibûn ji min re "Çima hûn li dijî  
MED'ê nanivîsinin? We pesna wê  
daye..." digotin. Li gorî wan min  
alikarî dabû televîzyona kurdan û ev  
geleki xerab bû, ez rexne dikirim.

*Hûn bi parastina mafê mirovan jî  
tên naskirin, ci bûn sebeb ku hûn  
mafê mirovan biparêzin?*

■ Dema darbeya 12'ê adarê çêbû,  
mafê min ji hate binpêkirin. Meslekî  
min ji destê min standin ku min  
geleki ji meslekê xwe hez dikir. Min  
nikaribû di bin şertê wan de xebat  
bikira. Ji ber ku weşana wan mafê  
mirovan ihlal dikir...

Ez bi neheqî ji kar hatim avêtin; di  
heqê min de doz vekirin. Li gelek  
hevalen min ên ku min ji wan geleki  
hez dikir, işkence kirin...

**Mammut Tali Öngören, ji aliyê parastina mafê mirovan ve tê  
nasîn. Lî apê wî Ibrahim Tali ji aliyê kurdan ve bi awayekî din  
tê nasîn. Wî li Amedê wezîfeya "Mufetîsiya Umûmî" kiriye. Bi  
gotina iro ew Super Walî bûye. Hevalê me RAHMI BATUR pê re  
li ser mijarêng cihêreng hevpeyvînek pêk anî.**

Di 12'ê rezberê (ilonê) de jî gelek  
hevalen min û kesen ku min ew nas  
dikirin, di bin işkenceyê re derbas  
kirin. Mafen wan ên insanî bin pê  
kirin.

Ji ber ku min ev neheqî dîtin, min  
di nav xebata parastina mafen  
mirovan de cih girt. Me rôexistina  
mafen mirovan ava kir. Jixwe ku te  
carekê dest bi têkoşîna parastina  
mafen mirovan kir, te ev neheqî dîtin;  
êdî tu bixwazî ji nikarî xwe bidî paş...

*Li gorî we pirsgirêka kurdan ji bo  
Tirkîyeyê tê ci maneyê?*

■ Ev pirsgirêk ji bo Tirkîyeyê  
pirsgirêka yekemin e. Qedera welat ji  
bi vê pirsgirêkê ve girêdayî ye. Ku  
em bi şeweyeke demokratik û siyasi  
çareser nekin, emê di bin vê pir-

Ev pirsgirêk ji bo Tirkîyeyê pirsgirêka yekemin e.  
Qedera welat ji bi vê pirsgirêkê ve girêdayî ye.  
Ku em bi şeweyeke demokratik û siyasi çareser  
nekin, emê di bin vê pirsgirêkê de bimînin.

**M.Tali Öngören**

Ez di sala 1931'an de li  
bajarê Stenbolê hatime dinyayê.  
Pisporiya min li ser weşana  
radyo û televîzyonê ye.  
Min di destpêka weşana  
televîzyonê de rîveberiyê dikir.  
Di sala 1972'an de ku darbe  
çêbû, min jî di nav wan kesen  
ku ji televîzyonê veqetiyan de  
cih girt. Piştî televîzyonê, min di  
zanîngehê de li ser radyo û  
televîzyonê mamostetî kir.  
Dema darbeya 12'ê rezberê  
(ilonê) hat, dawî li mamostetiya  
min a li zanîngehê anîn.  
Di gelek rojname û kovaran de  
min li ser sînema, radyo û  
televîzyonê dînîvîsand û vêga jî  
di rojnameya Cumhuriyetê de  
dînîvîsinim.

Ez Festîwala Enqereyê ya Fîlmân  
jî bi rî ve dibim.

bi ci çavî li pirsgirêka kurdan nêzîk  
dibûn" dikir; bi rastî ez baş nizanim.

Wê demê ez zarok bûm. Pişt re jî  
nebûm xwedî agahiyê rast.

Em bi gelek aliyan ve nikarin dîro-  
ka xwe hîn bibin. Apê min li  
Diyarbekirê walîtiya navendi kiriye.  
Di wextê wî de ci qewimîbin ez  
nizanim û nikarim hîn jî bibim. Li ser  
wê demê lêkolinênu ku mirov karibe  
pê ewle bibe tune ye. Kitêbin ku  
hene, zêdetir li gorî nîrîna fermî  
hatine nîvîsandin...

Di avakirina komarê de, mirov  
dikare gelek aliyan rexne bike, lê di  
navbera wê demê û iro de gelek ferq  
heye. Di têkoşîna neteweyî de tirk,  
kurd û gelên din, yanê xwedîyê vî  
erdi bi hev re li dijî dijminen xwe ser  
kirine, gerek e di navbera wan de ferq  
û meyli tune bûya.

Piştî avakirina komarê dengê kur-  
dan bi 'sûr' birin, xwestin kur-  
dayetiyeji holê rakin. Lî piştî cil  
salan, wê tevgera ku dixwestin  
vemirînin, hîn jî berê xurtir li hem-  
berî wan derket û hê jî dixwazin bi  
'sûr' vê pirsgirêka çareser bikin...

*Ev ci mantiq e ku, dibinin 'jür' nabe çare, lé disa ji, ji 'jür' pê ve nézikahî li tu riyî nakin?*

■ Dema gotina 'mantiq'ê tê guhê min, tiştên baş, fikrên rast û erêni têne bîra min; di vir de tu mantiq tune ye, tenê bêmantiqî heye. Baş e, ev israra bêmantiqiyê ji bo ci? Gelek sebeb hene:

Yek ji wan sebeban njadperesti ye. Hemû kes ji welatê xwe hez dike, kes nikare ji kesi re bibêje "Ez ji te zêdetir ji welatê xwe hez dikim."

Kî ku derekê ji xwe re wekî war ecibandibe, ew der welatê wî ye; koka wî ci dibe bila bibe. Lî njadperesti vê rastiyê dikuje. Wekî din; hinek tirsên civakî û aborî hene û komek tacirên welatparêziyê, wan tirs û sawêن civakê ji xwe re dikin perde û li ser milet mêtîngîriyê dikin. Ne tenê li kurdan û gelên din, her wisa li ser miletê tirk ji mêtîngîriyê dikin.

Care ci ye?

Care, hişyarkirina milet e.

Yêñ ku bi rastî ji welatê xwe hez dikin û bi rastî dixwazin li vî welatî demokrasî û birañ hebe, divê li ser çareserkirina pirsgirêka kurdan



# S

Gelek 'rewşenbir' û 'çepgir' ên tirkan ji bo slogan "Ne mutlu Türk'üm diyene" (Xwezi bi wî ku bibêje ez tirk im) dibêjin ev ne njadperesti ye, eger ku 'xwezi bi wî ku tirk e' bigotana wê çaxê dibû njadperesti...

Lê 'xwezi bi wî ku bibêje ez tirk im' nayê maneya 'xweli li wî ku nebêje ez tirk im?! Siyaseta ku tê meşandin vê dide nişan...

■ Rast e di navbera 'xwezi bi wî ku bibêje ez ew im û xwezi bi wî ku ew e' de tu ferq tune ye; ev njadperesti ye. Dema komar hatiye avakirin, belki ji bo yekbûna tirkan îltiyaç bi vê gotinê hebû, lê di şertên iro de parastina vê gotinê ji njadperestiyê pê ve ne tu tiş e.

Dibêjin bila her tiş û her kes tirk be, lê ku li vî welatî hemû tiş bibe tirk, wê ci bikeve destêwan?

■ Ez jî nizanim, ku her kes bibe tirk wê ci bi destêwan ve were; lê ez dizanim ku dema cudabûn û cihêrengiyê qebûl bikin, wê ji bo selametiya vî welatî çiqas baş bibe...

**iyaseta perwerdehî ya iro li ser bêsiûdiyeke njadperestiyê tê meşandin. Zanfneke nerast û çewt dide insanan... Ez jî nizanim, ku her kes bibe tirk wê ci bi destêwan ve were...**

Ji ber ku cihêrengî dewlemendî ye. Mesela dema tirk û kurd dicine Ewrûpayê, ewrûpî ji bo ku tirk û kurd kultura xwe biparezin, alîkarî didin wan. Ma ew kêmaqil in!..

Dema li Almanyayê njadperest maleke tirkan dişewitînin, em wan rexne dikin û divê ew rexne bibin jî. Lî dema eyñ tiş li welatê me jî biqewime divê em vê jî rexne bikin û ji bo ku careke din neqewime tedbir bistînin.

*Dema ku we di televîzyonê de rêverberî dikir, li ser siyaseta weşanê tişteku hûn pê aciz dibûn digewimîn?*

■ Rêveberiya min di destpêka weşana televîzyonê de bû; em ji du ekîban pêk hatîbûn: Ekîba program û weşanen û ekîba teknikê. Ez rêveberî weşanê û programê bûn. Ji sala 1967'an heta 1971'an min ev kar meşand. Ji me re "vî çêbikin, wiha bikin" nedigotin. Hinek em rihet berdîdan. Ji ber ku tecrûbeya televîzyonê tune bû, me her tiş ji nû ve çedîkir.

Ên ku em aciz dikirin gelek bûn, lê wekî siyaseta dewletê 'wî derxin, pro-

gramen xwe wiha çekin' kesi nedigot. Tiştekî din hebû ku di vê deme de di nava hemû saziyên dewletê de, saziya heri serbixwe ji TRT bû.

Yanê we ci biweşanda kesi itiraz nedikir?

■ Em hinekî azad bûn, lê tiştên ku nedixwestin em biweşinin û vekirî ji digotin, hebûn.

Ez vekirî bibêjim; ne ku em pirs-girêka kurdan bixine rojehê, ji bo ku em jiyana rojhîlat û rojavayê Tirkîyeyê ji her alî ve bidine naskirin, me hinek program çêkirin. Li ser van programan em rexne kirin. Digotin:

"Ew mirovîn ku bi ciliken dirandîne, aktor in, li vî welatî kesen wisa feqîr tune ne. Avahîyen kevn û xerab dane nişan; avahîyen wisa hebin jî geleki hindik in, çûne yêñ heri xerab kişandine."

Hinekan jî (xwende bûn, zanîngî qedandibûn) digotin; ev gundên ku kişandine ne yêñ me ne, gundên Suriyeyê ne...

Halbûkî me dîmenenê ku kişandibûn bêşîrove pêşkêsi temaşevanen dikir û min got; niyeta me jî, ne eşkerekirina



# D

pirsgirêka kurdan bû.. Lî me pirs-girêken bi tirkan ve girêdayî, gelekî dianîne rojehê.

Dema ku polis ketin zanîngîhe, me ew tev kişandin û weşand. Em li ser qanûna bingehîn disekezin; me madeyîn qanûna bingehîn şîrove dikirin; me digot ku, gel mafen xwe bizanibe wê zêdetir azad bibe. Li ser sisteme mêtîngîriyê û rewşa aboriyê me program çêdikirin û zêdetir em li ser wan hatin rexnekirin. Di dawiyê de jî mudaxele kirin.

*Li ser rewşa aboriyê dibe, li ser siyasete dibe, li ser pirsgirêka kurdan dibe, ferq nakê; dema ji we re cara yekemîn gotin 'programen wiha çênekin, newesîn!' hûn ci fikirîn? Yanê hûn dibînin ku pirsgirêkek heye, lê ji we re dibêjin: "Divê hûn nebînin an jî ev pirsgirêk tune ye..."*

■ Ez bi dilekî vekirî bibêjim: Tîriyam... Lî tîrsa min ne ji bo şexsê min bû. Yanê tîrsa min ne ji ber 'Wê vî binine serê min, wê min ji wezifeyâ min dûr bixin' bû. Ku wisa bûya min careke din dubare nedikir. Ü jîxwe di wê deme de ji bo min talûkeyeke şexsî tune bû: Malbata min diyar bû; ez li

Amerîkayê perwerde bûbûm. Di destpêkê de digotin:

"Ev ji me ye, ne zilamekî bitalûke ye. Hin tiştên ku dike ji, ji nezanîna xwe dike..."

Dema di heqê min de doz vekirin, dozger ji wisa difikir. Heta ku min di rojnameyê de dest bi nivîsinê kir. Min diyar kir ku tiştên ez dikim bi zanebûn dikim; wê wextê rewş guherî..

Tîrsa min a destpêkê ji ci bû? Min digot; ew bi vî rengî wê di nav gel de dijminatiyê biafirin... Ü dema em li rewşa iro mêze dikin, em dibînin ku ew tîrsa min ne beredayî bû.

*Apê we Tali Beg tê bîra we, têkiliyê we bi hev re hebûn?*

■ Têkiliyên me hebûn, lê wê deme ez zarok bûm. Min dibistana ewil dixwend.

*Cawa ku tê bîra we, mirovîkî cawa bû? Yanê otorîter, dilnerm, asabî, humanist... Cawa?*

■ Cawa ku tê bîra min, mirovîkî humanist û dilnerm bû. Jîxwe hinek Diyarbekirî ji, ji min re wî wekî

igotin: "Ev ji me ye, ne bitalûke ye. Hin tiştên ku dike ji, ji nezanîna xwe dike..." Dema min diyar kir ku tiştên ez dikim bi zanebûn dikim; rewş guherî...

mirovîkî baş salox didan. Digotin:

"Dema li wir wezîfe dikir bang li wan ên ciyê kirîye gotiye, werin em biaxîvin, lê dema hûn werin çekên xwe li ber derî bîhelin. Li gorî usûlê bila li odayê çek tune bin."

Dema tên çekên xwe li derive datînin, di navbera wan de nêzikahîyeke germ çêdîbe. Lî yêñ ku ev tiş dike, di emrê min de bûn. Wan jî, ji mezinêñ xwe seh kiribûn, mirov nikare ewle bibe. Tiştên ku digotin, rîwayet bûn.

*Ev pirsgirêk wê cawa çareser bibe?*

■ Dema miletê tirk perwerde bibe, were radeya ku bikaribe mafen xwe biparêze dê wê gavê mafen kurdan ji biparêze û wê pirsgirêk çareser bibe...

*Perwerdehi wextekî dirêj dixwaze; wê tirk û kurd heta wê wextê karibin barê vî serî hilgirin?*

■ Ev pirseke zor e... Hilgirtina barê vî serî ji bo her du gelan jî zor e û çîma hilgirin?! Tenê em dikarin hêvi bikin ku rojekê zûtirin dawîya vî serî were.

rawestin. Divê milet xwedî agahiyêñ rast bikin.

*Li gorî we bi çapemenî û bi siyaseta perwerdehiya iro, hişyarkirina milet mimkun e?*

■ Na, ne mimkun e. Siyaseta perwerdehi ya iro li ser bêsiûdiyeke njadperestiyê tê meşandin. Zanfneke nerast û çewt dide insanan... Çapemenî tiştîkî din e, dixwazî em li ser vê jî bisekinin.

*Ma çapemenî jî ne wasiteyeke perwerdehiye ye?*

■ Belê rast e. Çapemenî jî wezifeya perwerdekirinê dike. Mirov bi çapemenîjî perwerde dibin. Çapemenî li dijî vê siyaseta çewt, li dijî vê perwerdehiya şaş dernakeve, ji ber ku menfaetên çapemenîjî di vê siyasetê de ye. Ew ji pere û pê ve, tu tişti nahebinin. Ji bo ku hinekî zêde pere qezenc bikin, tiştîk namîne ku naakin.

Bi promosyon û siyaseta njadperestiyê, ev çapemenî, nezanînê bêhtir kûr dike.

# Rengek ji civaka me: Êzîdî

Îro birekî êzîdiyan li Laçinê,  
birekî wan li Şengalê ne,  
hinekî wan li der û dora  
Qerecdaxê, li Deşta Farqînê  
û hinekî wan jî li Deşta  
Xerzân îp. Mezinê êzîdiyên  
dinyayê Tehsin Begê ye.  
Meznê Şengalê  
Hemê Şêrê Xwedêdayî,  
Dawudê Dêwîd, Xidir Hesuna  
(li Îranê mir) ne.

Tarixa êzîdiyan li Mûsilê ji  
Şêx Hadî û ji lawê wî Şêx  
Hesen çebûye. Şêx Hadî, ji  
dora Erdê Sin û Xedra ku di  
navbera Mûsil û Dihokê de ye derket û  
çû Mekkêyê, berî dema Selahêdinê Ey-  
yubi bi 750 salî.

Kurê Şêx Hadi Şêx Hesen ji, ji Sin û  
Xedra diçe Mûsilê. Li gorî idiayekê  
Şêx Hesen diçe mizgeftê (wê demê mi-  
silman in) derâa şeple xutbê qixwîne,  
Şêx Hesen luşê xwe winda dike. Wê  
demê mirîdê Şêx Hesen radibin seyda-  
yê mizgeftê dikujin, lê kesê ku li miz-  
geftê ne jî radibin Şêx Hesen dikujin.

Di navbera gelê mizgeftê û mirîdên  
Şêx Hesen de şer derdikeye, wê çaxê  
du kurêن Şêx Hesen hebûne, mirîdê  
Şêx Hesen wan direyînin, dibin. Çiyayê  
Şengalê li rojavayê Mûsil û Hisicê. Na-  
vê yekî ji wan Yezid, navê yê tîn ji  
Merwan bûye. Tê gotin ku piştî vê,  
navbera misilman û êzîdiyan xera dibe.

Îro birekî êzîdiyan li Laçinê (Kur-  
distana Sor), birekî wan li Sengalê ne,  
hinekî wan li derdora Qerecdaxê, Deş-  
ta Farqînê û hinekî wan jî li Deşta Xer-  
zan in.

Mezinê êzîdiyên dinyayê Tehsin  
Beg e. Mezinê Şengalê Hemê Şêrê  
Xwedêdayî, Dawudê Dêwîd, Xidir Hesuna  
(li Îranê mir) ne. Şêxen Şengalê  
Şiwan û Muaviye, Şêx Hiseyn û Şêx  
Xelef (hevalên Celal Telebanî) in. Şêx  
Hesen û Şêx Xelef li Çiyayê Hekariyan  
di gel Elî Eskerî di sala 1974'an de ji  
hêla pêşmergeyên Berzanî ve hatin  
kuştin; ji ber ku hevalê Mam Celal Ta-  
labanî bûne.

Mezinê êzîdiyên Xerza, Bişarê Ko-  
loz, mezinê Wêranşar û Qerecdaxê Mi-  
ro û lawê wî Bişar e (îro Mîro miriye,  
lê Bişar sax e). Gundê wan Xirbêbelek  
e. Li navbera Nîşêbin û Cizirê, li gun-  
dê Hevîkî ya ku ji qewmê Serhanê  
Serhê û ji mala Haco ne. Dengbêj Dil-



**Êzîdî miriyên xwe tevî cil û kîncêن wan vedişêrin.**  
**Kijan heywanî ji bo qurbanê şerjê bikin, bi misilmanan  
didin şerjêkirin û lingê wê ya rastê bi sitûna malê ve  
dadileqînin. Kînc û cilîn pîrekên êzîdiyan bi piranî spî ne, zil-  
amên wan bi kagî koloz in (desmal û kum) û simbêlên xwe ber  
didin û naqusînin.**

gêş ji, ji êzîdiyên Eşîra Hevîkiyan e.

Li Herêma Soran di navbera Silêma-  
ni û Kerkükê de jî êzîdî hene. Lê îro pi-  
raniya êzîdiyan tev ji welatê xwe der-  
ketine û li dinyayê belav bûne.

## Hin ji orf û adetê êzîdiyan

Erf û adetên wañ û kufmancêni  
misilman gişt yek in ji bîlî dîn. Zimanê  
wan jî yek e, êzîdiyên tirk, ereb û ecem  
tune ne. Êzîdiyek li ku hebe kurd e.

Misilman Mihemed dihebîniñ, lê  
êzîdî Melekê Tawuz dihebîniñ. Ev yek  
ji dema Şêx Hesenê kurê Şêx Hadî ve  
heye. Fileh xwe sinet nakin, lê êzîdî ji  
weki misilmanan xwe sinet dikin. Mi-  
silman 30 roj, lê belê êzîdî 3 roj rojiyê  
digirin. Êzîdî û misilman di eynî rojê  
de cejna xwe pîroz dikin.

Êzîdî miriyên xwe tevî cil û kîncên  
wan vedişêrin. Kijan heywanî ji bo  
qurbanê şerjê bikin, bi misilmanan  
didin şerjêkirin û lingê wê ya rastê bi sitûna  
(sîrbinek) malê ve dadileqînin.

Kînc û cilîn pîrekên êzîdiyan bi pi-  
ranî spî ne, zilamên wan bi kagî koloz  
in (desmal û kum) û simbêlên xwe ber  
didin û naqusînin.

Êzîdî îbadeta xwe salê carek li cem  
şêx û feqîren xwê dikin. Di destê  
feqîren wan de misînek heye, her kes  
firaqekê dibe ji ava quđretê ku di mis-  
înê de ye tîjî dike, paşî ji vê avê li ser  
xwe direşînin.

Heca êzîdiyan li erdê Sin û Xedrayê  
Çiyayê Bermeqlubê ye. Kî here wê derê  
dibe hacî. Êzîdî xas (marol) û goşte  
kîviroşkan naxwin.

SALIHÊ KEVIRBİRÎ



## Ji NÇM'ê şaxeke din

Nîşêbinê Çanda Mezopotamyâ  
(NÇM) ku di sala 1991'an  
de li Stenbolê hatibû sazkirin,  
piştî şaxêñ xwê yên, Amed, Edene, Iz-  
mir û Hewlêrê, li Mêrsinê bi çoşke  
mezin, bi beşdariya zêdehi pêncsed  
kesen welatparêz, demokrat, saziyên  
mîna HADEV, İHD, ÖDP, DBP û  
SIP'ê vekir.

Vekirina NÇM'ê, bi sirûda netewe-  
yi "Ey Reqîb" û ji bo şehîdên şoreşê bi  
rêzgirîna hurmetê dest pê kir. Serokê  
NÇM'ya Mêrsinê Servet Özkan ji bo  
vebûna şaxekê nû ya NÇM'ê wiha aki-  
ví. "Ji bo' ku çand û hunera gelên bin-  
dest ên Kurdistanê bê ronikirin û ji' bo  
şoreşê ci destê kê were wê bike. Emê  
her dem di şopa Ehmedê Xani, Melayê  
Cizirî, Pîremêrd, Osman Sebîr û Apê  
Musa de bimeşin. NÇM wê di navbera  
gelan de bibe pira-çand û hunera qe-  
dexekirî."

Piştî axaftına Servet Özkan, Seroka  
Giştî ya NÇM'ê Nuray Sen derket pê-  
berî mîvanan. Nuray Sen wiha got:  
"Silav ji xelkê axa Mezopotamyâ re,  
silav ji zarokên çiya re û silav ji rojê  
re, silav li wan kesen ku di zîndanan  
de û li serê çiyê li ber xwe didin...."

Nuray Sen bi van gotinan davî li  
axaftına xwe anî: "Di destpêka sala  
1991'an de me soz û biryâr dabû gelê  
xwê, me gotibû em ji riya xwe derna-  
kevin, me sozê xwe anî cih û emê bê ji  
binin cih. Îro kilam, gotin, govendên  
me wê pêl bi pêl mezin bibê û wê li  
dinyayê belav bibe."

Sen di axaftına xwe de, mîzgîniya  
vekirina şaxa Ruhayê ji da û diyar kir  
ku wê di demeke kurt de hejmara şâ-  
xên NÇM'ê zêde bibin.

Di pey' axaftınan de ji NÇM'ya  
Edeñeyê koroya zarokên "Şitlîn Azadî"  
bi kîncêñ neteweyî û stranên kurdî  
û tirkî dîsa banga aşti, birafî û wekhe-  
viyê kirin. Çalakiyên vekirina  
NÇM'ya Mêrsinê ji gel re vekirî bû û  
7 roj dom kir. Di vê pêvajoyê de ji kó-  
mîn folklor, muzik û şanoyê ku xeba-  
tên xwe di NÇM'ê de didomînin,  
Ozan Xanemîr, Koma Çiya, Koma Ra-  
perîn, Koma Agirê Jiyan, Koma Rew-  
şen, Teatra Hêvî û hwd. derketin pê-  
berî mîvanan. Bi lîstîk û stranan, sev  
bi çoşke mezin qedîya.

AZADIYA WELAT/MÊRSİN



NÇM her diçe xwe xurt dilke, ji hêlekî ve cihêن nû vedike ji hêlekî ve ji hunermendan digihîne.

Pişî vebûna NÇM'ya şaxa İzmîrê, şcar li Mêrsinê ji NÇM'yeke nû hate avakirin. Bi avêlinâ van gavên girîng çand û hunera kurdfî her roj bêhtir xurt dibe.

Li NÇM'ya Stenbolê Şaxî Beyoğlu yê heftiyê ji ev çalakîyê çandî û hunerfî hene.

● 8.8.1996 Şemî

Konsera Koma Agîrê Jîyan, saet: 18.00

● 4.8.1996 Yekşem

Konsera Kutup Yıldızı, saet: 18.30

● 9.8.1996 În


Ji NÇM'ê şaxa hunerîn dîbarîyê, film: Roma Açık Şehir "Bajarê Vekir" Roma" Rejisör. F. Rossellini

● 10.8.1996 Şemî, Konsera Koma Çiya, saet: 18.30

Li Zanîngeha Azad, şaxa wê ya Stenbolê ji ev konferans heye: Girîngîya bi zimanê zîkmakî perwerdehî, Axdîger Beşîr Ant, saet: 18.00

## RÜDAN

# Qetlîama spî: Hüseyin û Ferhat



Hüseyin Deniz



Ferhat Tepe

**H**eke li welatekî bindestî û mêtîngîriya kedê hebe pêwist e mirov li hemberî wan têkoşînê bide. Pir cureyên têkoşînê hene; mirov bi çeka xwe têdikoşe, mirov bi pêñusa xwe têdikoşe û mirov her tişî di-de ber çavê xwe wekî Hüseyin Deniz û Ferhat Tepe. Lî ev jî neyê jibîkîrin ku mirinek bi sedan tê-koşer diafîrîne.

Li Kurdistanê rojnamevanî, nûçevanî li tu derê dînyayê di bin wehseteke wisa mezin de nîn e. Heke hûn rojnamevan an jî nûçevan bin, hûn li Kurdistanê ançax bi destûra dewletê dikarin agahî û nûçeyen xwe bidine weşandin, berevajiyê vê yekê ji bo we mirin e. Hüseyin, Ferhat û bi dehan rojnamevan û nûçevanîn kurd û yên demokrat di bin qedexeyan de, di bin tehdîtan de ji bo gelê xwe ev wezâfe dianîn cih.

Wekî tê zanîn di salê 1970'an de gerîlayê Filistîni ji bo ku pêkîtiya İslâîlê ji ser wan rabe û bibine xwedî dewleta xwe, livbazîyê wekî revandina rojnamevan an jî mîsyoneran pêk dianîn, lê belê heta ku hin maf bi dest nexistana ew bermedidan û nedikuştin.

Ferhat roja 28'ê tîrmeha 1993'an li Bilîsê tê re-vandin, hin kesen ku xwe wekî bi rêxistîneke nû nişan didin û daxwazîn ku malbata wî nikaribe di demeke kurt de bîne cih, dikin. Ev rêxistin bi vî navî xwe dide nasîn "Tugaya İntiqamê ya Osmani û Tîrkan". Mîlyarek pere, hin tûrîstê fransîz ku di destê PKK'ê de bûn û têvî girtina DEP'a li Bilîsê.

Dewletê xwest ku tiştekî bi vî rengî bike, lê bi

kuştina Ferhat ev qetikarî li stûyê xwe bar kir. Di ser kuştina Ferhat re sê sal borî, ci malbata Ferhat, ci ebûqatê rojnameya Özgür Gündemê ji bo qetikirîna Ferhat bê ronîkirin, serî li rayedaren dewletê xistin lê tu encam jê nestandin.

Kuştina Hüseyin Deniz jî bi awayekî eşkere hate kirin. Hüseyin berî ku bê kuştin, diyar kiribû ku du kesen bi navê Mehmet Kaya û Mehmet Güllî tehdît dikin. Roja 9'ê gelawêjê ew kesen ku wî tehdît dikirin ew li Serê Kaniya Ruhayê birîndar kirin. Pişti 48 saatet jî li Nexweşxaneya Amedê çû ser heqîya xwe.

Hüseyin nivîskarê rojnameya Welat bû jî, nêzîkî sih nivîsê wî bi navê Hüseyin Deniz û Dicle Fîrat hatine weşandin. Nivîsê wî piranî li ser folklor, danasîna pirtûk û zîmanê kurdî bûn. Kesen ku Hüseyin kuştin hatibûn dîtin û eşkalê wan jî, ji aliye dewletê ve dihate zanîn, lê nehatin girtin û darizandin.

Heta wê demê dewletê hebûna Hîzbûlîhê încar dikir, lê pişti kuştina Hüseyin bi devê xwe qebûl kir û pêwist nedît ku wan kesan bigire û bidarizîne.

Revandin û kuştina Ferhat jî, hin rêxistinê ku bi destê dewletê kar dikin derxiste holê.

Qetîmîke spî hate kirin. Cendekê Ferhat roja 4'ê gelawêjê li Elezîzê li devê Gola Hezarê hate dîtin.

Wezîfeya Hüseyin û Ferhat jî wekî ya her rojnamevan û nûçevanî bû. Lê nehiştin ew vê pey-wira xwe bînîne cih.

METİN AKSOY

## TİŞK

SÎRWAN REHİM



Goranî Kon

Cîvati kurd be siruş kirasi awdamani bezm û rezim, beyt û balore, helbest û sitranî be bala birawê.. Bo na? serbarî ewey le demî xoş, şadî û şahî da, goranî û awaz bala bala dest in û dilaramî be roh û can debexşin, herwesa le katî şin û taziye barîş da, lawandinewe û sikalakanman hewa û rezmîkî xoş awaz werdegrin û seburî be dil û derunî mirov deden.

Mirovî kurd ciya lewey siruşî xak û nîşmanekey harî karêkî gewreyetî lew mijare da, herweha dewruberekeşî keş û hewayekî aheng asay bo deafrênen.. Egerçî le rojî emroman da û le sayey pêşveçûne be lez û bezekanî zanîşî hawdemewe, dayikanî kurd destiyan le laylave û goranî witin bo zarokaniyan berdawe, belam zorîney ew dayikane bo xoyan be laylave, helbest û goranî dayîkî mîhrebânî kurd goşkîrîwin û neway ew denge awêtey xwîneyan buwe. Dayîkî azîz be dem laylave û goranî kurdîyewe ta beyan rayjendûn û be şîley hîro û gulawî balorey kurdevarî fîrîkî dawin.

Samanî hunerî goranî konman ew xermane be pît û berekete le xo da dexemlînê, ke le bîkirdin û piştî têkirdinî ziyanî gewre be êstay û sibeynî bizavî hunerî be taybetî û be sercem dînyay roşinbirîman be gişî dedat.

To were pêkewe tenha yek awir lew samane bideynîwe, yek awir û tîjtîperaneş ewsa bo xot serpişkî ra derbirîn be:

Sarî giranî ci nema le embarê / Dandok û rûn û sawar birdiyan zexîrey sarê / Mer û beranyan birdin, bizin be xo û be karê / Meyit û mirdîyan zor bû giştîyan fîrêda çarê. Eme nimûneyekî hîbstî heyran bû ke diyare min be bê hîc destkariyek nûsîwmetewe. Emaneş dû gûle nimûney tîrî ew baxçeyan:

Çawêkim dêşê, çawêkim tene / Dengî nenas dê lem Kurdistane:

Ew kêwe berze, ew tem le bine / Ewe tem niye, henasey min e.

Aşkîraye ke le naw zimanî ême û be zarawê coraw-corekanman be hezaran nimûney lem çesne hen û wekû zor şîti tirman bê naz û bê xizmetin û kes niye destî bûjanîwe û parastin be kakoliyan da bîhînêt.

Diyare em razey min rûy le aşna û roşnayane le her kwêyekî kurdîstan hen, bo ewey qolî kar û xebatî lê helmalin û le pêñawî ew mijare giringe da karêkî be derbest bîkrêt. Ê diyarîse karî wa ta zûtir bîkrêt be südtir û çatir e.

# Qencî û neqencî

**D**ibêjin du kes hebûne, yekî got ku qencî çêtir e, yê din jî got ku neqencî çêtir e. Gotin hev ku biçin cem ye-kî zana û aqilmend bipirsin. Ketin rê, qederekê cûn Şeytên xwe kir rengê alimekî mezin û hat pêsiya wan, got:

– Hûnê çi bikin, bi ku ve herin?

Gotine ku li yekî wekî wî digerin, pirseke wan heye. Van her du zilaman mesele jê re gotin û jê pirsin:

– Ka tu çi dibêjî?

Wî jî got:

– Wele neqencî çêtir e.

Ê neqenc got:

– Qenco, vêca min negot neqencî çêtir e? Wele ezê çavê te derinim. Ma çi bikim, me sert girêdabû.

Rabû çavê wî yê rastê derxist, kir bêrika wî ya çepê û çavê çepê kir bêrika rastê. È qencîwaz jî perîsan bû û cû qederekê meşîya. Li şikeftekê rast hat, wî jî got:

– Wele ezê jî xwe re îşev di vê şikeftê de razêm, ma çi bikim heta sibehê Xwedê kerim e.

Tu nabêjî ew şikeft cihê civîna şeytan an e. Bû sev, şeytan tev li bertifka xwe civîyan û bûyêrên ku di rojê de kîrine wê jî hev re bibêjin. Yekî got:

– Èê... me çi dît iro, kî çi kir, ji me re bibêjin?

Yekî got:

– Wele min iro du heb berdane hev.

Yekî got:

– Min iro dilê yekî li yekê xera kir. Her yekî tiştek got, ê mezin got:

– Wele ez iro zehf negeriyam, lê min tişteki pir baş kir.

Ên din jê pirsin bê çi kiriye. Got:

– Wele ez cûm vê jora hanê, min dît du kes ji wê de tê. Min got hûn kî ne hûn pirsa çi dikin. Gotin wele em li alimekî, li meleyekî digerin da ku ji me re bibêje ka qencî çêtir e, yan neqencî pir çêtir e. Min gote wan ku neqencî pir çêtir e. Rabû Neqenco çavê Qenco derxistin. Yê rastê kir bêrika çepê û yê çepê kir bêrika rastê.

Qenco di paşıya şikeftê de guhdariya wan dikir. Vêga yekî gote yê mezin:

– Vêca dermanê başkirina çavê Qenco çi ye?

È wilô kirî got: “Wê çavê bêrika rastê piçek ji vê xweliya li ber me lê bixe û bixe çavê çepê, yê din jî wilô, wê sax be.”

Qenco di paş şikeftê de ji xwe re “Mala Xwedê ava be, wele qencî winda nabe” got.

Yekî got: “Pira Cizîrê jî her roj çedîkin û heta êvarê xwe nagire dikeve.”

Yekî got: “Ma derman çi ye?”

Got: “Mirişkeke reş e, bênişan e. Li serê şerjê bikin temam e.”

Qenco dîsa di ber xwe re “Mala Xwedê, ava be, wele ezê bi qencîya xwe bibim mihendis jî” got.

Yekî got: “Qîza mîr jî laşê wê di pirz û palan de maye. Ma dermanê wê çi ye?”

Yekî din got:

– Mejiyê seyê (küçük) filan kesê ye.

Qenco di paşıya şikeftê de ji xwe re got: Mala Xwedê ava be, wele ezê bi qenciyê, bibim hekîm jî.”

Şeytan an li xeberdana xwe dewam kîrin. Yekî got: “Wele min iro xezîne-yekî di filan derê de veşart.”

Qenco jî wê derê nas dike. Qenco ji xwe re ma di paşıya şikeftê de heta si-behê, şeytan derketin derve ku feşadiya xwe dewam bikin. Qenco jî hêdî hêdî xwe gihande ba tifika wan û çawa ku şeytên gotibû, çavê xwe çêkirin û berê xwe da xezîneyê; xezîne derxist cû ba wî şivanê ku şeytan behsa kûcikê wî kiribû. Got:

– Şivano, vî seyê hanê bide min.

Şivan got: “Ez seyê xwe nadim te”

Gotê: “Te çiqas mal bivê ezê bidi-me te.”

Wî jî rabû seyê xwe firot Qenco. Qenco seyê xwe kuşt û çû ba karmendê Pira Cizîrê, got:

– Hûn zanin çawa çêkin, hûnê pira xwe ava bikin, wê xwe bigire?

Gotin: “De ka bibêje keçeloko, me mihendisek nehiştiye, pê dernexistine. Hema tu jî ya xwe bibêje, emê wê jî bicericibinin.”

Got: “Mirişkeke reş a bênişan li ser Şerjê bikin, li gorî min êdî nakeve.”

Li ser vê xeberdana wî pê kenîyan. Qenco dewam kir: “Nekenin, çêkin ku çênebû piş re bikenin.”

Yekî got: “De hema wê jî emê çêkin, ma ne her roj em lingê pirê fireh dîkin û teng dîkin û bi pêş ve didin û bi paş ve didin? Hema emê gotina keçelo jî jî dilê xwe derêxin.”

Mirişkeke reş tînin li ser pirê şerjê

dîkin, êdî pir nakeve.

Qenco ber bi qesra mîr ve diçe, dibê-jê:

– Ez hekîm im; hekîmê pirz û palan im.

Gotin:

– Pa ne hekîmek nema ku keça mîr nîşî wî nekirin. De bila keçelok jî hekîmiya xwe lê bikê.

Mîr got:

– Keçelok, bi soza Xwedê eger tu keça min baş tedawî bikî û sax bibe, bila ji te re be.

Qenco bi gotina mîr qayil bû. Ji mîr re got:

– Here xweşik serê wê bişo û bîne ba min. Ezê derman bikim.

Dema xweşik serê wê dişon û tînin ba keçelok, mejiyê se xweşik tê dan. Keçik pêcan du rojan ma di nava wî meji de. Gava derxistin, bû wekî zîv.

Mîr got:

– Wele te qîzik li xwe helal kir.

Rabû li koşekî bajêr qesrek ji xwe re ava kir û keça mîr xistê û xwedîyê qen-ciyê gîhişte qencîna xwe.

Em bîn ser çiroka Neqenco. Rojekê Neqenco berger bûye ji xwe re parsê dike. Rastî qesra Qenco tê. Qenco wî di pencerê re dibine wî nas dike, gazi wî dike. Wî tînîn jorê. Xwarinekê didiyê û jê dixwaze ku ji wan re bipeyive.

Neqenco:

– Wele ma ez çi bibêjim, min mala xwe carekê xera kiriye, ez û yekî din ketin nîqaşê, min got neqencî baş e, wî got qencî baş e. Me got emê herine ba alimekî. Em çûn, di rê de em rastî alimekî hatin, me pirs kir, got neqencî baş e, min rabû mala xwe xera kir her du çavê wî derxistin

Qenco:

– Ew ez im.

Çiroka xwe ji serî heta binî jê re got. Neqenco “Ez jî wilô bikim”, got û rabû berê xwe da wê şikeftê, ka ew jî nabe mihindîs û hekîm, xwedîyê zêran.


Çû li paşıya şikeftê xwe pehn kir, bû êvar şeytan tev hatin disa dest bi bûyêrê ku nava rojê rastî wan hatine kiri. Yekî “Pira Cizîrê xwe nedigirt, wa ye çebûye” got, yekî “Qîza mîr jî dibêjin sax bû”, yê din “Xezîneya min jî hinan ji wir derxistîye. Wê rojê me behsa wan kir, belkî hin tez dengê mebihistibin. Ka em li paşıya şikeftê bigerin, eger hinan dengê me kiribe, niha her roj tê.”

Rabûn her yekî bizotek agir girtin destê xwe û bi paşıya şikeftê ketin, yekî wiha nîrî, ku laşekî mîran xwe di wî erdi re direj kiriye, gotin “Bi Xwedê ev e yê ku li me guhdarî kiriye.” Her yekî bizotekî di laşê wî re kiri û ew kuştin. Bi vî awayî Neqenco gîhişte neqenciya xwe çawa ku Qencî jî gîhiştibû qenciya xwe.



# Pariyek rastî / Dağdakiler

**W**eşanxaneya Metis li ser rêza Siyahbeyaz (reşûspî) pirtûkeke nû weşand, bi sernavê "Dağdakiler/Bagok'tan Gabar'a 26 Gün". Ev pirtûk bi destê rojnamevan Kadri Gürsel hatiye nivîsandin. Kadri Gürsel mijara pirtûkê ji jiyana xwe derxistîye. Gürsel, du sal bû ku di ajansa fransi AFP'ê de dixebeitî. Hevalê wî Fatih Saribaş ji wênevanê ajansa Ingiltereyê ya



DAĞDAKİLER

BAGOKTAN GABARA 26 GÜN

Kadri Gürsel

Siyahbeyaz  
MÜTEŞEEL GÜNCEL

**Bi ya min nivîskar Kadri Gürsel di sê xalî de tenezar e. Yek ji wan ev e ku ew jî wekî hemû endamên civaka tirk, İnsanên kurd û hêzên kurdan ên çekdar nas nakin.**

**Ji psikolojiya gelê me û ji şervantiyê fêmkirin, di demeke kurt de tiştekî ne hêsan e.**

bi nav û deng Reuters'ê bû. Gürsel heya ku ev pirtûk amade nekiribû hê ji rojnamevan bû.

Di meha reşemiya 1995'an de artêşa tirk, bi navê "Çelik Harekatı" operasyonek li Başûr pêk anî. Di wê operasyonê de li gorî agahiyan 50.000 leşker û gelek ji cerdevan cih girtin. Çapamêni di vê bûyerê de nêzîki 12 rojan tu tiştek nenivîsi; ji ber ku rayedârên operasyonê nehiştibûn. Gava ku di dawîya 12 rojan de êdi biryara qedexekirinê rakin, Gürsel û nûneren çapemeniyê din çûbûn Başûr. Dûv re zivirîn û di dersînorê Xabûrê re ketin hundir. Gürsel û Saribaş bi hev re ne.

Di dema zivirînê de, di navbera Silopi û Amedê de rê tê birîn; pişt re ji di kevin destê gerilayen. Pişti 26 rojan di 25'ê avrîlê de tê berdan. Niha ev pirtûk, encama wan rojan e. Û bi kedeke mezin hatiye amadekirin, li gorî min ji gelekî balkêş e. Balkêşîya wê bi du

awayî divê bê dîtin.

A yekemîn: Niha dozdeh sal e ku li welatê me şerekî qirêj berdewam e. Di nav van salan de nêzî 30.000 kes hatine kuştin, lê belê li ser vî şeri ji aliye berheman ve (an ji aliye nivîskî ve an ji ji aliye dîtbaryî ve) pir hindik tiş hatine amadekirin.

A duyemîn: Ji derveyî kurdan bi çavêkî demokratîk li ser vê problemê zêde kes ranewestiye. Gürsel di vir de, di xaleke girîng de cih distîne. Ji ber ku ev kes tirk e. Berhem, bi vî rengî ku bê dîtin ji her ali ve baştîr e.

Dibe ku xwendekarên kurdu ji hin tiştan aciz bibin, lê belê divê bê zanîn ku, tu kes ne mecbûr e ku her tişti li gorî dilî me binivîsîne; jixwe imkan ji nîn e. Gere mirov ji tengasiyan fêm bike.

Bi ya min nivîskar Kadri Gürsel di sê xalî de tenezar e. Ji wan a yekemîn: Ew kes ji wekî hemû endamên civaka tirk, insanên kurd û hêzên kurdan ên

çekdar nas nakin. Ji psikolojiya gelê me û ji şervantiyê fêmkirin, di demeke kurt de tiştekî ne hêsan e. A duyemîn ji; nivîskar an ji tesîra perwerdebûna xwe, an ji li gorî rewşa xwe difikire ku hin tişt wê neyîn nivîsandin. Jixwe qanûnên iro ji ne musait e. Ku bê nivîsandin bêguman hin tişten ne xweş wê werin serê wî. Dudiliya wî ji ji vê yekê ye. A sêyemîn ji; hin tişten ku hatine gotin ji rast in. Lî insanên me divê di tespîtkirina kîmasiyê xwe de neqehire. Ev rastî ne. Gava ku mirov ji vê yekê re dilîkesti bû, pêşveçün geleki zor e.

Bi kurtası çavdêriya min ev e ku, mirov dikare gelek tiş jê derxe. Jixwe kesen eleqedar gere wisa jî bikin. Heta ku mirov bi awayekî analîtik nefikire tu encamên baş jê dermaxe. Gere mirov bêhîs nebe, ev rast e; lê belê hîs ji divê zêde nekeve pêşîya mantiqê. Ji ber ku jiyan bi zagonê aqil dom dike. Hin caran bêaqılı bi ser bikeve ji. Pirtûka Kadri Gürsel ji bona şiyarbûna gelê tirk pêwest e. Divê berhemên bi vî rengî her tim zêde bin.

DAĞDAKİLER/

Bagok'tan Gabar'a 26 Gün

Kadri Gürsel

Metis Güncel/Siyahbeyaz, 167 rüpel

DÜZGÜN DENİZ

## Refah û sîstema derewan...

A. MELİK FIRAT



**R**ojekê ez li mala dostekî xwe rastî İlhan Selçuk hatim. Min jê re "Hinekî mirov zen dîkin ku tu marksîstî, lê tu kemalîstî; çer te wisa dizanî?" got. Wî li min vegerand û got: "Çawa ku di dînê İslâmê de mezhep û terîqat hene, di kemalîzmê de ji mezhep û terîqat hene. Yanê liberalê kemalîzmê hene, dîndar, mûhafazekar, marksîst û sosyal demokratîn kemalîzmê ji hene. Ez bi xwe ji cepgirekî kemalîst im."

Di vî welatî de her tiş li ser derewan hatiye avakîrin: Cumhuriyet, demokrasî, hurriyet... Hemû derew in. Ji peyvî naborin, vala ne... Rêxistîn û partiyê siyasi hene, lê tu li kijan partiyê binîhîrî, tev bi prensîb û Înqîlabîn kemalîzmê sond dixwin. Çawa ku yekî misilman amentûbilâhî bixwîne, ew ji bi serê Ataturk sond dixwin û bi xwedîtiya wî ji bawer in; dibêjin ew nemiriye!

Yanê wekî gelek tiştan, partiyê vî welatî ji şeklî ne... îro di meydana siyaseta Tîrkiyeyê de kemalîzm hukimran e; ne liberal, ne marksîst, ne sosyal demokrat, ne ji mûhafazekar û dîndar hene; giş bi kemalîzmê sond dixwin...

Hinek marksîst û zêdetir ji ateîstîn kemalîzmê, digotin ev parti şerîfet dixwaze. Refahê ci bigota jê bawer nedikirin. Digotin ev teqîye dike, her çiqas bibêje ez kemalîst im ji,

misilman e, şerîfetxwaz e.... Lî derewan dîkin. Li ser vê yekê cepgirekî tîrkan tespîteke rast kiribû:

"Refah ne ku ji bo me, ji bo marksîst û kemalîstan, lê ji bo misilmanan teqîye dike; misilmanan dixapîne. Di esasê xwe de, ew ji me ye, mûxalîfîn rejîmê dixe bin kontrolê..."

Refah bi xwe dibêje: "Na! Ez bi Ataturk bawer im, şaxekê vê sîstêmê me, ku Ataturk li heyatê bûya wê di partiya me de cih bigirta."

Xwe bi vî awayî diparêze, lê ji aliye din ve ji ji xelkê dîndar re "Em misilmantîyê tînin, ev nîzam, nîzama kufrî ye!", dibêjin. Xelkê ku bi misilmantîyê bawer in, wer ikna dîkin.

Ji ber ku Refah ne iktîdar bû, ew gotin tev di şilotiyê de diman. Rastiya wê nedihat zanîn. Lî ji niha û bi şûn de zêde qisekirin ne lazim e. Ew iktîdar e. Heke gotinê xwe, waedîn xwe bi cih bîne, wê gotina wan kesen ku digotin "Refah doza misilmantîyê dike" rast derkeve. İca ev partiyê din li iktîdarê ci dîkin, ew ji wan bike; sabit dibe ku ew ji partîyeke kemalîst e, partîyeke sîstêmê ye. Misilmanan dixapîne, wan di bin bandora xwe de ferxes dike, dixesîne û teslimê kemalîzmê dike...

Dibe ku Erbakan di dawîyê de bibêje: "Wele min dixwest bikim, lê nehiştin!"

Heke vê meseleyê xelas bike; her kes ê dibêje. Yê ku mirovan dikuje ji "Min nedixwest, yê ku hate kuştin ez mecbûr kirim!" dibêje; yê ku dizî dike "İhtiyaciya min hebû" dibêje; yê ku here tecawîzê irzê yekê bike, dibêje: "Qisûra min tune, wê wer kir..."

Nîhayeta vê mantiqê tune; mazeret xelas nabin... Di sîstema îlahî de ji, di sîstema beşer de ji itibara van mazeretan qet tune ye. Partî ji bo ci çêdibe! Hedefa xwe ilan dike, dibêje ku ez hatim iktîdarê, van dikim.... İcar wexta ku

bibe iktîdar ji, bibêje ez nikarim, bila nebe iktîdar.

Wekî din ji, qenaeta min ew e ku Erbakan ji her kesî zêdetir ji bo malê dînyayê teşne ye, ti ye.... Ji bo xwarîn û vexwarîn, wergirtin û koşk û vilayen dev vekirî ye... Xwedî ihtiraseke ecêb e. İcar mirovên ku ji bo insanan, ji bona xweşîya insanan, ji bona seadeta wan, ji bo ku meddûr û birçî û belengaz tune bin xebat bike, divê ewil di nefsa xwe de tetbiq bike. Ku ew bi xwe di nav kîf û seyranê de, di nav zêr û pereyan de asûde bişî; ev dike dirûti, rûşî û minafîqi.... Yê ku bibêje diziye nekin, gerek e ew bi xwe diziye neke. Jineke ku bêşîfet be, bêşîfetîye tenkît bike, çenabe... qîmeta wê tune ye.

Çi îlahî û ci beşerî, di nav alema dînyayê de hinek qayde û prensip hatine danîn. İnsan ji sînôren van qanûnên nabore. Yen ku bîborin û ji xwe re mazeret bîbînîn, kes nikare bi wan re minaqeşeya tiştekî bike. İro ilmî felsefeyê pîvana aqilê insan e. Filozof hene, lê di muqabilê wan de ji sofist hene; ew ji safsete dîkin. Yanê di zahir de, sofist ji wekî filozofan dixuyin; tu zen dîkî ku ew ji neticeyan derdixin, lakin her tişti li hev diqelibîn, safsata dîkin. İcar welitekî ku tê de siyaseta rast bi cih nebe, sofistî wê zêde dibin.

Di nav welatî tîrkan de yên ku derew dîkin, dibêjin: "Min siyaset kir..." Derew, ji xwe re kirine siyaset. Ji ber vê yekê ji, li vî welatî ajotina siyasetê zor e.

Ez naxwazim zêde li ser Refahê bisekinim. Di heqê wan de qenaeta min bîst sal berê çêbûye. Lî ji ber yên ku hikum di destê wan de bûn, ji Refahê bêhîr xedar bûn, me ji bona wan tiştek nedigot. Lî iro bûne iktîdar, em tev wê bi hev re bîbînîn ku ji ci qumaşî ne...

# Ê kurê kerê nêr e ha!

**W**ekî tê zanîn heta salên 1970'an ji gundiyeñ Kurdistanî kêm kesan bi zimanê tirkî dizanibû. Li ser riyêñ ku dikevine bajarê Kurdistanê ji her tim leşkeran lêgerin û lepisin dikiçirin, ki biçuya bajêr jê dipirsin ka bi ku de diçe, çima diçe û hwd.

Rojekê yekî gundi kerê xwe dibe bajêr da ku wê bifirose. Dema ku nêzîkî bajêr dibe leşker pêşî lê digirin jê dipirsin:

— Nereye? (Tu diçi ku?)

Gundi wisa fêm dike ku cinsiyeta kerê wî dipirsin. Dibêje:

— Nêr e, ezê bibim bifirosim.

Leşker hêrs dibe car din dipirse:

— Nereye?

Gundi dîsa bersiv didê:

— Weleh nêr e.

Leşker bêhtir hêrs dibe şimaqek, dudo li gundi dixe. Gundi jî hêrs dibe hemâ bi destê leşker digire, dibe nava lingê kerê û dibêje:

— Aha tu ji min bawer nakî bi xwe lê binihêre. Kurê kerê ez ji te re dibêjim nêr e, tu dîsa fêm nakî?

## XELAT...



Bersiva Xaçepirsê (25)

Xaçepirsâ me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigilijin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya 27'an kitêba Suzan Samancı "Barjarê Mirinê" ye.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hin "Peyva Vêşarı" di nava quityen li bin xaçepirsê de binivisin û tevi adresa xwe ji me re bisinîn.



Kesêñ ku xelata xaçepirsâ 25'an, kitêba Medenî Ferho "Berxwedan Jîyan e" qezenc kirine: Muhammet Şah/Batman, Erdal Batum/D.Bakır, Abdullah Seziş/Van, Remzi Kolhanlı/Urfa, Aydin Karahan/Kızıltepe, Kadir Öztürk/Istanbul, Burhan Babaoğlu/Bartın, Özgür Halk/Ankara, Azad Jîyan/Ankara, Abdullah Jîyan/Antep



## Çep rast

**D**ema beriya 12'ê rezberê li her derê çepgiri û rastgiri hebû. Li her bajari, herêma çepgiran cihê bû, yê rastgiran jî cihê. Tu kesê çepgir nikaribû bike-ta herêma rastgiran û tu rastgir jî nikaribû biketa herêma çepgiran.

Gundiyeñ kal diçe bajêr, dibîne ku li serê rê hin ciwan sekinîne. Dema nêzîkî wan dibe, silavekê dide wan ku ji wan bibore. Ciwan jê dipirsin: "Xalo tu çepgir f an rastgir i?"

Kal ditirse, difikire, ji xwe re dibêje "Ez bibêjim ez çepgir im lê ku ew rast-

gir bin, ez bibêjim ez rastgir im îcar ew çepgir bin ezedîsa lêdan bixwim. Ezê hema milê xwe yê çepê rakim bibêjim rast, milê xwe yê rastê bilind bikim bibêjim çep; belkî ez xwe wisa xelas bikim."

Milêñ xwe radike û dibêje: "Çep, rast."

Ciwan dibêjin: "Xalo ma milê xwe yê çepê tu bilind dikî dibêji rast, tu milê xwe yê rastê bilind dikî dibêji çep.

Kal hema bersiv dide wan: "Lawo wele milê min jî nizanîn çep ci ye, rast ci ye?"

## XAÇEPIRSA BIXELAT (27)

Rojnameva-neki şehid (wêne) Paşverü	Geometri Cinavkeke İşarki	Mam Salon	Karvanî	Sembola Osmiyûmê Naveki Jînan	Madeyeke kimyevi
Cihazeke ragihandînê Banesane			6	Yekemin	Jî rêzê
	Bi zazaki 'av'			Kilam	
				Türkê pereyan	
Yekineye-ke leşkerî ya diroki Litre				Lêgerin	
	Dirsek				
	Eko, aks				
Qeynax			Notayek		
Cure		Navek	Lîva hewayé		
				Notayek	
7				Qey	
Êris Reşahîya li binê firaqan					
			Xerabeyen li Qersê		

PEYVA VEŞARI

1 2 3 4 5 6 7

## Laçî bene laçî sene

**W**ekî tê zanîn li Kurdistanê dema ku li gundekî dawet, go-vend hebe, ji endamên malê çiqas mirov hebin giştik diçine govendê.

Dîsa rojekê li gundekî Serhedê dawet heye, ji mala Heso tu kes nemaye cûne dawetê.

Evarê Heso tê malê dibîne ku tu kes tune li malê û golikên wan jî nehatine.


Wekî dînan dikeve nava gund li ji-na xwe digere. Dibîne ku li dawetê ketiye serê govendê, stranan dibêje û vedigerine.

Heso şerm dike ku jina xwe ji nava dawetê derxe. Ew jî diçe dikeve serê govendê; dest pê dike ji ber xwe straneke derewîn dibêje:

Laçî bene laçî sene  
Golikên gund giştik yê me ne  
Jina wî ji lê vedigerîne:  
Laçî bene laçî sene  
Ez dizanim li malê lêdan hene"

BERHEVKAR:  
M. AGIRI

## XAÇEPIRS



\* Partiya Republikê pîstî ku hatina ser hukmetê ji sozêñ xwe ye berê yet bi yek vedigere...

BIRAYEMIN!  
QEY TU XWE SAS  
KIRI...  
VI...VI ALI...

DÜVRESK  
ABDULKADIR YİSEK



**WELAT**

Rojnameya Hesfeyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yaymcılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

Geriñendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMİ TAN  
RAHMİ BATUR

Berpirsê Karê  
Nivisaran  
(Yazıcı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHIR ELDEMİR

**NAVNIŞAN**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212) 251 90-13.

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRİN  
Biryay Dağıtım  
(BİRYAY)

NÜNERİTİYEN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:  
Mazhar Günbât  
Suriye: Jân-Dost  
Helim Yûsiv  
96-321720568  
Berlin:  
Silêman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçük  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

BrukSEL:  
Medenî Ferho  
32-02-465037  
Stockholm:  
Robin Rewsen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
Remzi İlhan  
312 06 32 31 28

Celle:  
Wezir Sacık  
49 50 52 87 36

## Zimanê me hebûna me ye

**Z**iman di nav mirovan dê wêkî pi-rekê ye, wekî riyeke ye, wan ber-bihev tîne, wan bi hev didê fêm-kirin, jiyanekê hevpar çedikê. Komêh mirovan (ji.yên biçük hetâ yên mezin) tîne holê bi.vî awayî ji civak peyda di-be.

Li ser rûyê diniyâye awa bi awa; çur bi, cur ziman hene, nayê hejmartin. Her yek li gorî xwe rengîntir û şîrîntir in. Ji wan ziman-an yek ji; zimanê kurdî ye.

Zimanê kurdî gelek dewlemed û fireh e. Di Rojhilatê Navîn de, di nav ziman-an de ciheke girîng digire, ji ziman-en cîrânan ge-lek di bin bandora wî de mane. Di dirokê de ji ziman-en ku xwe li piyan girtine yek ji zimanê kurdî ye. Lê belê rûmeta vi-zimanê mîzin ji aliye xwediye wî ve nehatiye za-

**Neteweya kurd, hebûna  
xwe ya iro bi giranî  
deyndarê zimanê xwe ye. Divê  
em kurd vê rastiyê baş bizanîn.**  
**Lê iro hinek ji rewşenbir û  
xwendiyê me vê rastiyê baş fêm  
nakin an jî guh nadînê. Ev jî der-  
beyeke mezin li me dixe û  
me dide şermê.**

nîn.

Neteweya kurd hebûna xwe ya iro bi giranî deyndarê zimanê xwe ye. Divê em kurd vê rastiyê baş bizanîn. Lê iro hinek ji rewşenbir û xwendiyê me vê rastiyê baş fêm nakin an jî guh nadînê. Ev jî derbeyeke

mezin li me dixe û me dide şermê. Ev şer-mekê mezinî. Li dînyayê, tu netewe tune ku bi zimanê xwe nepeyive. Her netewe ji zimanê xwe hez dike û dîparêze.

Gavâ em ji hinek hevalan dipirsin: "Hün deqê zimanê kurdî de ci difiskirin?" Wê çaxê bersiva me wiha tê dayîn: Hîn wexta wî nîn e.

Ji nirkênu ku iro kurd xwînâ xwî li ser di-rijînin yek jî ziman e, mirov dikare bibêje cihê pêşin jî digire. Ez disa dibêjim, ziman hebûna me ye, divê em vê rastiyê di.mêjiye xwe de bi cih bikin.

Heke iro ne wexta wî.be, emê kengê bi zimanê xwe bipeyivin? Bila zimanê me, hebûna me ji destê me neçe, em bi dest û leşan pê bigirin û dev jê bernedîn.

A. BELENGAZ

## Qelsîtiyê di rojnamegeriya kurdî de

**D**i pêvajoya rojnamegeriya kurdî de ev nêzîkî 3-4 sal in ku rojnameyên xwerû bi kurdî têne weşandin, mîma "Welat, Welatê Me û ya dawî Azadiya Welat." Wexta em li van weşanen mîze dîkin, bi giştî em dibîpiñ kû tu gelemîse û cudayetiyê mezin di navbera wan de çenebûne, kema hema hemû bi eyîn şeklî û sîsilî derdikevin. Tu tesîr û bandora wan li-ser gel bi awayekî eşkere nehatiye dîtin, ji ber vê ji traşa wan dikêve, ev jî dibe sedemâ ku rojname têkeve temgasîyan û bi taybetî yên aböri. Ev tiştî ku me li jor got tê wateya ku li dijî xwendin û nivîsandina bi kurdî guhnêdan. û sar-bûneke mezin heye.

Heke ev berî dema şoreşê bûna ineyê bigota gel nezan e, ne hişyar e. Lê vê gayê ev tiştîn e, xebata neteweyî heta dawiyê xurt e, gel pir peljen û hesgir e û têdikoşe. Lê çima wekî ku li têkoşina xwe xwedi derdikeve, li zimanê xwe jî xwedi der-nakeve?

Ev yek, qelsbûnekê di rojnamegeriya kurdî de şanî me dide. Gerek e ev qelsbûn bête dîtin. Li ser vê rewşa xerabe bête rawestin. Légerin û lêkolinêni bi cidiyet li ser bêne çekirin, bersiva gelek pîrsan

bê dayîn kâ xwestek û daxwazên gel-çi ne, çima rojnameyên bi kurdî naxwînin, sedemâ vî tiştî ci ye û hwd.

Li ser vê rewşê ez jî dixwazim li gorî zanîna xwe çend pêşniyazan pêşkês bikim

1. Rojname bi destan jî bê belavkirin
2. Di televîzyonan de reklam bêne weşandin
3. Divê têkili bi xwendevanan re bê xûrtkirin
4. Nûnerîtiyê rojnameyê besdarî hemû şahî û civînên ku çedibin bibin, der barê zimanê kurdî de axaftinê bikin û gel teşwîki xwendîna rojnameyê bikin:

5. Divê weşanen ku bala zatokan bikişinin bêne çekirin.

6. Heke imkan kebin bi hevkariya NÇM'ê dem bi dem kurs bêne lidarxistin.

7. Li gorî imkan û derfetan alfabe kurdî bê belavkirin (li mal, kargehan)

8. Nameyên xwendevanan bêne weşandin, bi taybetî yên yekemîn ku têş şandin, ev ji wan re dibe teşwîkî kû nivîsandina xwe berdewam bikin.

REMEZANÊ HÜRÎ

**Heke ev berî dema  
şoreşê bûna meyê bigo-  
ta gel nezan e,  
ne hişyar e. Lê vê gavê  
ev tiştîn e, xebata  
neteweyî heta dawiyê  
xurt e, gel pir peljen û  
hesgir e û têdikoşe.  
Lê çimâ wekî ku  
li têkoşina xwe xwedi  
derdikeve, li zimanê  
xwe jî xwedi  
der-nakeve?**

# Mirov bêyî hunerê

# nikarin bijîn

Dema hê çînî û neteweyî tune  
bûn huner hebû. Niha çîn û netewe heye,  
huner dîsa heye. Ji bo wê yekê li ser  
huner diseke nim.

**L**i gorî ku ez dizanim di demen da-  
wî de herî pir tu li ser wêneyên  
razberan dixebeitî. Ji me re wan  
xebaten xwe tu dikarî şirove bi-  
ki?

— Jixwe, têgiha wêneyê ji hev cihê-  
kirin rast e. Wêneyên razber (soyut),  
razberkirin, wêneyên gîrgîn (somut),  
wêneyên natûral em dikarin ji hev cihê  
bikin. Razberkirin di wêne de ne dûrî  
wêneyê natûral in û deformebûna wê-  
neyê natûral in. Wêneyên razber ku di  
xwezayê de qet şopekê nakişinin ew in.

Min di berhema xwe de teví sazû-  
mana şewldanê razber û gîrgîn bi hev  
re pêk anî. Şewl gava tê girtin, wêneyê  
razber, gava şewl vêdikeve jî razber û  
gîrgîn bi hev re xuya dikan. Ji van bin-  
geha realist derdikeyin navendê.

Di wêneyên min de ji natûralê tam  
vegetandin tune ne. Bi rasti gotina min  
ev wêne ha razber bûye ha jî gîrgîn bû-  
ye qet ferq nake. A gîrgîn ew e ku hun-  
ermend ci xemgîniyê dikişine.

Yê ku di pêşangeha te de digerin ji te  
pirsekê bipirsin û bibêjin ev wêneyên te  
ci dibêjin, bersîva te wê ci be?

— Car caran wêneyek qet tiştekî jî  
nabêje, lê belê paşengeh giştik car ca-  
ran tiştekî dibêje. Tu rastiyê bixwazî, tu  
bibêji ev wêne vê dibêje ne rast e. Ji ber  
ku, pêşangeh giştik tiştekî dibêje û na-  
vê wê jî "Azadi" ye, yek wêne ci dibê-  
je qet ne gîrgîn e.

Hunermend îcrakar in, hunermend  
tim nijdevanî ne. Hunermend tişte ku  
çedikin, nabêjin ku her kes gerek e wê  
bisanibe û vê xemgîniyê jî nakişine.  
Divê ev jî wekî qet nezanînê neyê şiro-  
vekirin.

Kapitalizmê têgiha huner û huner-  
mend dejenerê kiriye?


— Pir rast e, pir xweş. Raweya huner-  
mend? gelekî gîrgîn e. A niha li Tirkî-  
yeyê ji her kesi re hunermend tê gotin.  
A gîrgîn ew e ku kî ji wan re dibêje hun-  
ermend, elektronik medya dibêje hun-  
ermend.

Ji bili bêhunermendiyê her tişt in  
jî. Di latinî de hunermend û pişkarî  
(sanaetkar) ji hev û din cihê ne. Li wê  
derê têgiha "artîst" heye. Wekî wêne-  
van û hunermendê wênevan, hêkeltraş  
û hunermendê hêkeltraş. Yê ku bi wê-  
ne re dibilin resam in, kes nikare bibê-  
je ku ew ne resam in, lê belê huner-



## Cafer Tabak

Di sala 1956'an de li  
Afşîna Meraşê hatiye  
dînyayê û di sala 1994'an  
de Fakulteya Hunerên  
Bedew a Zankoya Hacet-  
tepe xelas kiriye. Beşdarî  
Pêşangeha Resîm-Hey-  
kelê ya Dewletê, DYO û  
hwd. bûye. Ji sala  
1980'an û heta niha karê  
xwe di kargeha xwe de  
dike. Berhemên hunermend li derveyî welat û li hundire  
welat di gelek koleksyonan de cih girtine.



mendên wênevan kî ne, ev kurtasi, sifte  
û tek kijan e, kî tiştekî orjinal çêke,  
ew hunermend e.

Li gorî te di berhema hunerekê de  
neteweyî û çînî cer girêdayî ne?

— Ez wiha raman dikim, gerek e çîna  
huner tune be. Hûnê bibêjin, çîn iro hu-  
ner naxebitînin, dixebitînin, lê belê çî-  
na huner gerek e tune be, huner ji bo  
hemû mirovan e. Hunera neteweyekê  
tenê nîn e, li cihekî kî jîn dibe ya wan  
giştan e. Li gorî min li cihekî tevíhev kî  
jiyana xwe derbas dike, kijan netewe  
dibe bila bibe çanda wekî hev, par ve  
dikin.

Mebesta min ji çînî perçiqandî û si-  
temkêş e.

— Lî binihêre, bi vî qeydeyî, hunera  
ku cihekî wî nîn e şansê wî tune ku bi-  
be hemgelî. Destpêkirina huner an erdi-  
nî ye yan jî neteweyî ye.

Ji çanda mirovan derketina huner  
dijwar e, gava ji çanda mirov huner  
dernekeve hemgelî nabe. Dema hê çînî  
û neteweyî tune bûn huner hebû. Niha  
çîn û netewe heye, huner dîsa heye. Ji  
bo wê yekê li ser huner diseke nim.

Tu yekî kurd i, li ser te politikaya  
asîmîlaşyonê çîqas xwe rê daye?

— Li ser min pir zêde bandora wê bû.  
Zimanê diya min kurmancî ye ez ne  
kurmancî dizanim bixwînim, ne jî dikâ-  
rim rind mijûl bibim. Dema min dest bi  
dibistanê kir, ez bi zimanê dê mijûl di-  
bûm. Gava min dibistan xwend û ber-  
dewam kir, min zimanê dê ji bîr kir. A  
niha kurmancî fêm dikim, nikarim ve-  
gerînim. Ber re ber re em jê dûr ketin,  
lê em tu car dev ji çanda xwe bernadin.

Tîştekî ku tu bibêji wekî gotina  
dawi?

— Erê heye. Ez dibêjim ku mirov tu  
car bêhuner nikare bijî. Lî yê ku dibê-  
jin em bêhuner dijîn jî ew xwe wisa di-  
zanin. Rûyê hunerê bi mirovan re teví-  
hev bûye û berî teknolojiyê û berî çînan  
hebûna xwe anîye meydanê.

Huner karê çandiniyê ye. Yek jî dix-  
wazim balê bikişînim ser vê: Huner ge-  
rek e ji sloganan dûr be. Slogan dikeve  
nav reklaman. Gava reklam armanca  
xwe bînin cih, rûmeta xwe winda dikin.

HEVPEYVİN:  
EYÜP DEMİR